# هەزار گۆتنێن بەریا

## ئێن ئێزدیان

ئەلیاس قیرانی

&

حەیدەر ئەلیوسڤانی

2025

ناڤێ پەرتووکێ : هەزار گۆتنێن بەرییا

جور: ( فولکلور)

بەرهەڤکرن و کۆمکرن : ئەلیاس قیرانی & حەیدەر یوسڤانی

بابەت: گۆتنێن بەرییا

دیڤچوونا زمان: سەعید جردۆ

دیزاینا بەرگی: دخیل جانو

دیزاینا ناڤەروکێ: عەلدینێ قولۆ

چاپا ددوێ: جەنگەل 2025

Email, tel :eliasqirani91@gmail.com

مافێ چابکرنێ پاراستیە، کۆپیکرن یان بەلەفکرنا ناڤەرۆکێ قەدەغەیە

**دیاری**

ئەم دیاری داپیر و باپیرا دکن،هەکە هەتانی رۆژا ئیرۆ ل کەشکولا خوەدا پاراستینا.

**سوپاس ژ بۆ:**

**هەر کەسێ گۆتنەك ل بیرا مە ئانی و دایە مە.**

پێناسەیە نڤیسەران :

ئەلیاس عەلی ئەلیاس ، تێمە ناسکرن ب ئەلیاس ڤیرانی ، ل سالا 1991 لکۆمەلگەها سیبایێ یا باشوورێ چیایێ شنگالێ ژ دایك بوویە مە ، خوەندنا خوە هەتا ئامادەیی ل سیبایێ من ڤەتاندیە و بشترە من بەشێ پەرتووکخانە و زانستێ تەمام کریە ل زانکۆیا موسل ل سالا 2014 ، هەروەسا ب زمانێ کوردی ، کورمانجی ، عەرەبی ، ئێنگلیزی زانم ، ئەز هەلبەستێ د نڤیسم و کارێ رۆژنامەڤانیێ دکم ل دەزگەهێ ئێزدی نیوز دە بەرنامێ (وارێ باب و کالا ) بێشکێش دکم ، ل گەل حەزکرن و شاباش.

حەیدەر عەرەبۆ یوسڤانی ل سالا1991 ل کۆمەلگەها بورك ل باکوورێ چیایێ شنگالێ یا ب سەر ناحیا سنونێ ڤە یا ژ دایك بوومە ، من خوەندنا خوە هەتانی شاشێ ئامادەیی ڤەداندیە ل بورك ، پشترا بەکالریووس ,کولیژا ئاداب – بەشێ دیرۆك – ل زانکویا مووسل تەمام کریە ، من بەشداری ل رۆژنامە دەنگێ لالش ، شنگال لالش ، گۆڤارا مەحفل و گۆڤارا لالش کریە ,و گەلەك گۆتار ژی داینە دەزگەه و مەلبەران . من پەرتووکەك چابکریە ب ناڤێ خەملا هەزار ڕەنگ ل سالا 2021.

## پێشگۆتن....

هەردۆ نڤیسەر و ڕەوشەنبیرێن خوین گەرم و چەلەنگ ئەلیاس ڤیرانی و حەیدەر یوسڤانی زەند و باسکێن خوە ڕامالینە ژ بۆ گەریانێ ل پێ کۆمکرنا گۆتنێن بەریا ل دەڤەرا شنگالێ ، بێ بێهنڤەدان شەڤ و ڕۆژ کرینە یەك هەتا دەستکەکا پێکهاتی ژ هەزار گۆلێن ڕەنگ و ڕەنگ ژ باخچێ فەلسەفا باب و باپیران بچنن و لگولدانەکا پر ڕەنگین دە بکەنە دیاری ژبۆ ئاشقێن دیرۆك و کەلتور و فەلسەفا و زمانێ مللەتی خوە، گۆتنێن بەریا دەسپێکا ناساندنا ناسناما مللەتانە ب جڤاکا مرۆڤایەتیێ لەوما جیهێ پووتەپێدانەکا مەزنن ژ ئالیێ کەسانێن پسپۆر ل بوارێ ئەنترۆبۆلۆژیا و بپێی دەولەمەندیا وان گۆتنان ب ڕامان و هزرێن ئەفرێنەر ڕادەیا پێشکەفتن و شارستانیا هەر مللەتەکی دهێتە دیارکرن .... ڤان هەردۆ هێژایان هەموو هەولێن خوە خستینە دگەردا ژبۆ گەهاندنا بیر و بۆچوونێن بابکالکێن مە دەرباری مژارێن جودا جودایێن ژیانا جڤاکێ و ئەو ژینگەها تێدە ژیایین ... دەڤەرا شنگال ژی کو ب مۆتکا گەنجینا فۆلکلۆرێ کوردی دهێتە هژمارتن هەتا نهۆ گەلەك ئالی ژڤێ سامانا پر بها لێ نەهاتینە ئەرشیفکرن لەوما فەرە پێنگاڤا برایێن ب ڕوومەت و قەدەر کاك ئەلیاس و کەك حەیدەر ببیە هاندەرەك ژبۆ تیهنییێن هزر و بیرێن بەرییێن مە ل قوناغێن دیرۆکی یێن جودا دە داکو لسەر هەمان ڕێکێ بەرهەمێ کەدا هەزارێن سالا ژ بەند و چیرۆك و ئەفسانە و دۆرك و سترانا ژ نەمانێ قورتالێ بکن .... جارەکا دی ب گەرمی دەستێ هەردۆ مامۆستاییێن قەدر گران دگڤیشم و پر ژ دلێ دەست خوەشیێ ل وان دکم ب هیڤیا ئەڤ بەرهەمێ گرانبها جیهێ خوە یێ هەژی پەرتۆۆکخانا کوردی دە بگرێ ....

سعید جردۆ ، کەمپا ئێسیان 2021

## گۆتنێن بەریا  پێشیان چنە ...؟

گۆتنێن بێشیان، بەریان ، مەزنان ، حکمە ، ئادڤسە ، پەند ، گۆتنێن بەریان بەشەك ژ ئەدەبی فلکلۆریە ، گۆتنێن گەلێن یێن ب هەزارێن سالا بابیر و داپیرێن مە ل کەشکوولا خوە دە پاراستین ، سینگ ب سینگ ، دەڤ ب دەڤ ، نەفش ب نەفش گەهاندیینە مە ، ئەمژی وێ وسا بگەهینن یێن ل پێ خوە رە ..ئەڤ گۆتنێن بەریا هاتینە بکارئانین و خوەیێ وان نە دیارن ناڤێ وان ، لەوما بوونە یێن بەریا ، پێشیان دا گرتی  ژ ڕامانا و سەربۆرن، و شیرەتن شەهرەزا و ئاقلمەندا گۆتیینە هەر یەك ژی چیرۆکەك ، سەرهاتییەك ، بوویەرەکە ل دەرەکێ روودا یە و هەر وسا رەخنە و شیرەتن د هوور و کوورن وەکە ئەم دبێژن کورت کورمانجێ و سەمبۆلێکن (رەمزی) نە زوو ناینە فیم کرن لێ ڕامانا وان کوورە و ل فەلسەفەیا ژیانا رۆژانە تێن بکارئانین ل ناڤ گالا گالا رە هەینە وەکە ماستەکی ل مەشکێ بدی و ب کەینی ئەڤ نیڤشکێ گۆتنیێ یە ، ئەڤ گۆتن نە ملکێ کەسی نە و ل هەموو دەڤەرا ب یەك ڕامانێ تین ب کارئانین بەلکی دەڤۆك جودابێ ، دڤێ پێ نەیتە لەیستن یان ژ واتا خوە دەردکەڤن, ئەڤ گۆتن ل سێ قوناغان رە دەرباس بووینە، بەری ئەڤ پەیڤ گۆتن بوون پشترە بوون زانست پشترە بوون پەند و شیرەت .

1- چما هەزار گۆتن ؟ ئەو هەزار گۆتن بتر هەینە لێ ئەڤ کەدا چەند سالەکێ بوو مە ژ دەڤێ داپیر و باپیرا بهیست و ڤەگوهاستن و ل ناڤ گالاگالا رۆژانە هاتن گۆتن و گۆتنا هەزار چما ؟

بەرێ هەکە پەزێ یەکی بوبا 1000 سەری یەکی ژێ بەردان وەکە خێر دگۆتن مە سەری هەزاری بەردا .. و هەر وسا دبێژن :هەزار و یەك ناڤ ل خوەدا یە وناڤێ مەزن هەر خودا

-2گرنگیا گۆتنێن بەریا چ یە ؟

گرنگیا وان ئەوە ل ناڤ گۆتنێن رۆژانە دە تێن بکارئینان و ب هێز دکن کورت و جەوهەرینە و هەموو رەخن و شیرەتن و بوویەر و سەربورن ، وەکە پەچەکا مرۆڤ دکە ناڤ هەریێ دکە کەرپیچ ڤەوی دکە گۆتنێ و ب هەڤ ڤەگریددە ب رستەکە کورت هەر وسا ل جڤات و مەحفەلان تێ بکارئینان لناڤ گالا گالا رە و گەلەك جارا ناڤ بوویەرك روودde گوشتن دلایین دیسا وەك دبێژن : خوین ب خوینێ نایێتە شۆشتن ، ب ڤان گۆتنا وان بەرۆ ئاشتی و لهەڤ هاتنێ ددن.

## ئـ

1.ئینسان تەیرێ بێ چەنگە

2.ئینسانێ غەریب ئی کۆرە

3.ئێ قەنج ل خوە نا حەیرێ

4.ئێ نە ل شەر شێرە

5.ئێ ژ نیڤێ رێ ڤەگەریا نەی پۆشمانە

6.ئێ بلند فری وێ نزم کەڤە

7.ئێ نەکر ب ئا مەزنا لی تێن قۆچێن بزنا

8.ئێ زانە زانە،ئێ نزانە باقا نیساکا نە

9.ئێ شل ژ بارانێ ناترسێ

10.ئێ زانبن هنگڤ ببرێ وێ مێش پێ ڤەدن

11.ئێ بترسێ ناپرسێ

12.ئێ محتاج مەینوکە( بێ رویە)

13.ئێ کێری خوە نەهات،کێری کەسی نایێ

14.ئێ دەریێ خەلکێ کوتا،خەلک ژی وێ دەرێ وی کوتێ

15.ئێ ژی تێ،لی تێ

16.ئێ زاڤایەکی وی هەبێ،کەرەکی وی هەیە

17.ئێ قەدرێ داک و بابا گرت،قەدرێ خودێ گرت

18..ئێ زەوجی،عەوجی

19.ئێ ژتە مەزتر ب رۆژەکێ،زاناترە ب سالەکێ

20.ئێ کەچ دا ب ژنێ،ئاخرەت دا ب دنێ

21.ئێ ب ئاقل گوهدار کر،ئێ بێ ئاقل بهور کر

22.ئێ نەکر ناخوە

23.ئێ جهل چووکا ل بچەنگا خوەدە د بژیرن

24.ئێ نە ژ مالەکێ نزانێ ب حەوالەکێ

25.ئێ بیژێ و بکە مێرە،ئێ نەبیژێ و بکە شێرە،ئێ بیژە و نەکە کەرێ نێرە

**ئه**

1.ئەو وارە لێ نە ئەو بوهارە

2.ئەز نە بینم ژنا ب یار و مێرێ ب گوهار

3.ئەورەکی رەشی تاری نە هەبەک وەشیا و نە هەبەک باری

4.ئەو چ دبیژێ و تەمبوورا وی چ دبیژێ

5.ئەو تەحتا تە پیدە میستی بارانێ شۆشت

6.ئەو ژنا بێ مال و مێرە بێ خێرە

7.ئەم نە دچونە کورەکی،نوهە دچنە تورەکی

8.ئەمێ بنە قوچ،هوون ببنە تەیر

9.ئەزێ یەکێ بتەکم،هەکە بێ ب کۆنێ کەڤر نەکری

10.ئەمانەت هەتا ب قیامەت

11.ئەم بوونە پرسکار سەر زمانا

12.ئەڤ بوو سەرێ گا

13.ئەڤ لێ لێ یە هیژ لۆ لۆ مایە

14.ئەرد ئەمانەتێ خوە ناخوە

15.ئەز دکەلینم وی دڤێ کەفێ ل سەرە بگرێ

16.ئەڤ ژی هێسنێ وێ کێرێ یە

17.ئەم بوونە وەکە نەهلا ل کەڤر کەتی

18.ئەم ماسیا ل بەحرێ دە ناکرن

19.ئەز کەتمە نێڤا حەسەن و دەفێ دە

20.عەیشکا ل خوە ب شکە

21.ئەو دیوانا تو نەخوەستی نەچێ تێ

22.ئەز دبیژم نێرە و تو دبیژی ب دۆشە

23.ئەز ژارا ژار دکم و بارا بار دکم،هەکە نەی رادی یە ب سەردە خوار دکم

24.ئەرزانی یە بێ خێرە

**ئا**

1.ئادارێ مەشکە ل دارێ

2.ئادارێ سەرێ دارێ خوەشترە ژ بنێ دارێ

3.ئادار گەهشتە بیستان خوەش دبە باغ و بوستان

4.ئادارێ سبەهێ سارە و نیڤرۆ بوهارە

5.ئادار د رەشینێ،نیسان د خەملینێ

6.ئادارێ بەرف گەهشتە پەلێ دارێ،**نەما** دانێ ئێڤارێ

7.ئا دەڤ ژ منرە،ئا دل ژ تەرە

8.ئاڤا بیر ب تەدبیر(تەکبیر)

9.ئاڤ ئاڤانی یە

10.ئاڤا خوەستی ناچە هەستی

11.ئاڤ زانێ کیدەر نیسکا تینێ

12.ئاڤ و ئاڤ چوو

13.ئاڤ ب حەقیا خودێ دسەکنێ

14.ئاڤا کۆتەکا بەرۆ ژۆر دچە

15.ئاڤا تە و وی ب سایگەکێ دە ناچە

16.ئاڤێ ڤەخوە ژ کەهنییێ،ژنێ بینە ژ ئەسلێ

17.ئاڤ کەتی یە قولا وی دە

18.ئاڤێ ل پایا خوە دەو دکە

19.ئاڤ ل روێ وی نینە

20.ئاڤا سەر بەروێ وەک زاڤاییێ ب دلێ خەسوێ

21.ئاڤ ل جهێ تەنگ دە دەنگ ژێ تێ

22.ئاڤا سەرێ تە ل کوچ کر

23.ئاگرێ کێ گەش بێ ئەو ل بەرە

24.ئاڤ ژ سەرێ کەهنییێ د خەودێ

25.ئا ژنکێ و هەڤیرە،مەهنا لی دگرێ

26.ئا تە نە ژ کرکێ و بن دەیە

27.ئا هنکا گویزن د خشخشن،ئا هنکا تەمرن ددەوسن

28.ئاقلێ سڤک بارێ گرانە

29.ئاڤ هەموو تشتا دشوێ،رویێ رەش نەتی

30.ئاقلێ بێ ئاقلا نیسکا نە کەلۆکە

31.ئاقل نە ل بەژنێ یە،ل سەری یە

32.ئاقل نه ژ کچک و مەزنتی یه

33.ئاقلێ جهلا(خۆرتا) ل چاڤا دەیه

34.ئانی ژ دەری یا دا ب خێرا مری یا

35.ئاقلێ دینا ل بن کوم دەیه و کوم ل سەری یه

36.ئاقل تاجێ زێرینه ل سەرێ هەموو کەسی دە نینه

37.ئاقل دەهیەکا خودێ یه(1__10)

38.ئاش دگەریێ،ئاشڤان پەسنێ خوه ددە

39.ئاش چوویه،چەق چەق مایه

40.ئاشێ خوەدان سعودا بێ ئاڤ دگەریێ

41.ئار ژ کەسێ بەلەنگاز رە بارە(مەبەست شەرەفە)

42. ئاغا هەر ئاغایه

43.ئالیەکی دنێ خێره و یەک شەره

44.ئا یێ دین و دەستا شیره

45.ئاگر ل قورما دەیه

46.ئاگر ب ئاگر ڤەنامرێ

47.ئاگر بابه نابێ رابه

48.ئاگر ب دارکێن کچک هلکه

49.ئاگر بەردا کایێ خوه دا بەر بایێ

50.ئاگرێ بن کوچکا دیمی گەرمە

51.ئاگر ب مالا یەکی کەت،یەکی دگۆت کا جغارا خوە پێ ڤێخم

## ب

1.بارێ کەتی ل ئەردێ نامینە

2.بارێ خوەهر ناگەهیە مال

3.بار ناچە با کەر،کەر دچە با بار

4.بازدار نیڤێ مێرانتیێ یە

5.بار من نا ئێشینێ،سەر بار من تێشینێ

6.بابێ کەچا مێرە

7.بەرو ژ قالکێ خوەیە دەرە

8.باش ئۆلداش هەیە و خەراب ئۆلداش هەیە و خاین ئۆلداش هەیە

9.ب وەریسێ خەلکێ نەچە دارا

10.بوکا مەزن کەبانیا مالێ یە

11.بوکا سەر هەسپێ یە خودێ زانێ رسقێ کێ یە

12.بابێ خوە کوشت دا ب گۆرێ سۆند بخوە

13.بوک بێ زمانە،خەسو بێ ئیمانە

14.ب توفەنگا خەلکێ شەر نابێ

15.بو بەرۆشا بەهلول

16.بوکا سالێ بەردە مالێ

17.بوک بونە ددۆ،خەسو دانە هەڤدو

18.بوکا مام ئۆسمانە،ئیڤارە ل کەزوانە سبەهێ ل سەر بانە

19.بو فت فتا مریشکا،دیکا خوە دا ئەنیشکا

20.بو هشتن ب تەنێ ناخوەشە

21.بهار ژ کیس کەرێ نێر و مرۆڤێ بێ خیرەت دچە

22.بهارێ تینی یە چۆکێ

23.برا برایە و بازارە جدایە

24.ب گولەکێ نابیە بوهار

25.بلا ل رۆم بە،نە ل گۆر بە

26.بزن ژ شەڤەکێ رە جهێ خوە خوەش دکە

27.بلا مرۆڤی دەیندار بێ نەی خویندار بێ

28.بزن ب پیێن خوە و مە ب پیێن خوە،هەر کەس و عەمەلێ خوە

29.برایێ نە ژ دێ سلاڤ کر ژ پێ ژ بەر معتبا دنێ

30.بزنا کولەک و شڤانێ سڤک پێکرە دگەهن مال

31.بلا نانێ تە جە بێ،بلا خولکێ تە گەنم بێ

32.بزنا کۆل حەلمی یە دەهنۆکێ شۆر

33.ب زمانێ خوەش تو کاری مارا ژ قولا وان دەرینێ

34.ب کولمێ نەچە درێشێ(درێش:وەک شوژنە)

35.برچی بوون کافرە،گونەهێ وێ ب کەسی نایێ

36.بلا بوکا تە گێژ بێ نە زمان درێژ بێ

37.ب تلی یا کول دە نامیزێ

38.بلا بەلا وی ژ بەر لنگێ وی بێ

39.بەهوەری وەکە چاڤە،هەکە موویەک کەتە ناڤە خودان ژ بەری تەنگاڤە

40.بلورا بەر گوهێ گایە

41.ب گۆتنێن ژنا مەچە کۆمێن زێرا

42.بدە پیسێن خوە ژ ئاغایێن خەلکێ چێترە

43.ب ئالاستنێ زک تێر نابێ

44.ب دوعایێن تە نەبووی مە هەتای ب نفرێن تە بمرم

45.بلا چاڤێ مرۆڤ دەرکەڤێ نە ناڤێ مرۆڤ

46.برینێن کەڤن نو نەکە

47.بەرێ مرنا بەشەر ل سەر کەفا دەست بوو دیم دگەریا،نوهە ل قورم گوهێ یە

48.ب پرسێ چوو خورسێ

49.ب نفرا تێ چی ئافرا(ئافر=ئافراندن نەبوو)

50.ب تایەکی رەشکێ دکەلێ،زو دکەلێ

51.بریندار ب برینا خوە زانێ

52.بلا دل ب دل بێ،بلا تورکێ پارسێ ل ملبێ و بنێ تورک ژی قول بێ

53.بیرا مرۆڤ کەڤر ئاڤێتنێ خەلک ژی وێ ئاڤێژتێ

54.بیرا تە ئاڤ ژێ ڤەخوار کەڤرا ناڤێژتێ

55.بەر ژ بەستا خەلاس نابن

56.بیر ب دەرزیێ نایێ کۆلان

57.بیهنا داکێ ژ خالتیکێ تێ

58.بیهدەرا دەرەنگ ما نابە خوەرێ خوەیی

59.بیهدەر ژ خوەدانا جوامێر ترە

60.بیهدەرا شریکا ئاگر پی کەت

61.بیهدەرا کایێ هەجێ هات و مەلهبەک دایێ

62.بینە کەچا 40 سالی نەینە ژنەبی یا 20 سالی

63.بەری بارانێ خوە شل نەکە

64.بەلەنگازی نە ملکێ کەسی یە

65.بوو ڤیتا هەسنێ هەوێری

66.بەری بارانێ با تێ و بەری مرنێ شید و تا تێ

67.بەرف دەهوەتا کوچکا یە

68.بەرو ژ قالکا خوە دەرە

69.بەرف د هلیێ،چا دمینێ

70.بەرتیل کەڤرا نەرم دکە

71.بەهر ب دەڤێ کوچکەکی نا حەرمێ

72.بەری وەرمێ داخ بکە

73.بەلەکو ب لەپێ خو

74.بەختێ مێرا زێرێ زەرە

75.بەنکەکی ژ قادێ هلینە،هەکە ت پێ محتاج نەبویی وەرە من پی ب خەنقی نە

76.بلندی ژ قولپ و شالا رە،کنکی ژ ڤان مالا رە

77.بێ پیرەکی نەچە دیوانا میرەکی

78.بەتەری ژ گایێ جۆهت رە نامینێ

79.بەرخێ نێر یێ کێرێ یە

80.بەرێ بخوە پاشی ب شێکری نە

81.بەروو دا بزنێ دەڤ ئاڤی تە قاچکێ

82.بەرخێ مژۆک ژ دوو داکا دمژێ

83.بەخت نادم ب تەخت

84.بوو تەنیا سیلێ ب منڤە

85.بەتالی خەراب مالی

86.بەرۆش ل سەر سێ کوچکا دسەکنێ

87.بەرۆشا ب تنێ حەیاتا ل ڤێ دنێ(جودابوونە)

88.بەشەر ما ژ ئاخێ تێر ناخوە

## پ

1.پاریێ حادر نەدە ب یێ دەین

2.پالە پۆشە(ژ گوهـ خوە کرن (

3.پیرەکێ باڤێژە خوەشیێ و جوانەکێ باڤێژە رەشیێ و لی بنێرە

4.پاریێ مەزن گەروێ د درینێ

5.پارسەک ب پارسەک نەخوەش بوو خودانێ مالێ ب هەردوا نەخوەش بوو

6.پەزا ل تال ڤە ما گورێ خون

7.پەیڤێ بکرە نە بفرۆشە

8.پرس بکە ژ خۆرتەکی دنیا دیتی و ژ کالەکی زەمانا

9.پیرێ گۆتە کەچا خوە نەچە نێڤ خۆرتا گۆت ئا تدبیژی قەومیە

10.پیرۆ چو ئاڤا دنیا چو ل بەر تاڤا

11.پەسن ژ مێرا رە حەیبە

12.پیری و هەزار حەیبی

13.پەیڤێن ئیڤارا دکەڤنە قولێن دیوارا

14.پینە داز پێخواسن جومکار دبێ کەراسن

15.پەهلێ خورت پەریزە کفشە

16.پەریزا ب سەر شۆڤێ ڤەیە

17.پەیڤا خوەش بدە خەریبا و پاریێ خوەش بدە ئێ خوە

18.پرانیێ خەلبێ مێرانیێ بر

19.پیرەکا بی وەکە کەراسێ سپی

20.پسیکێ چاڤ بەلەکێ میهڤانا خوەشن شەڤەکێ

21.پەسنێ ژنا خوە مەکە یان پشتی هەفت سالا

# ت

1.تاليا دەرەوێ ئا كورتە

2.تاليا تەمايێ گو خوارنە

3.تالی و ئاقوبەت

4.تال و شيرين ژ دەرەكێ تێن

5.تاڤەک کەت،ل پژيا کەت ل دێلێ نەكەت

6.تاشتێ وەكە دەولەمەندا بخوە،و شيڤێ وەكە بەلەنگازا

7.تاڤەكە نيسانێ هێژايە بەرانێ براهيم خەليل و مالێ خۆرستان

8.تشتێ نە ژ منرە وەكە بايێ ل سەر منرە

9.تشتێ چوو نەدە دوو

10.تليێن دەستێ تە هەموو نەد وەكە يەكن

11.تەير ب رەفێ خوەرە ئی قەنجە

12.توركێ ڤالا ب كۆلێ خوەدە نەكە

13.تشتێ تە نەديت ب چاڤێ خوە نەبيژە ب دەڤێ خوە

14.توركێ دزا ب قولە

15.تەنور ب تر و فسا گەرم نابێ

16.تيشكێ مارا ژی هەر مارن

17.تی سۆتن نایێ گۆتن

18.تەباخێ ئاگر چو ئاخێ

19.تەر و هشک پێک نە شەوتینە(یان پێک شەوتی)

20.تەنگیێن خوەدێ مژێن گەلیانە

21.ترس مەرگێ ریڤی یە(روهـ)

22.تەیرەک ل سەر سەرێ خۆرتایە هەکە زەوجی نو خوە بەردە سەری

# ج

1.جاوێ سپی رەش نابێ

2.جینارا بەری مالێ بگرە

3.جینار شفای جینارە

4.جیناری قەنج خوەی و خوەدانە

5.جوامێرا گۆتییە:رەهنێ خوە بقەلیشە و گەنم بکە

6.جەر ل ریا ئاڤێ دە دشکێ

7.جۆرێن خودێ هەموو نە شید و تای نە

8.جنەت نە ب منەت

9.جنەتا تە مالا تەیە

10.جهێ مربێن تە لی نەبن نە وارێ تەیە

11.جوانیا مێر ئاقلێ وی یە

12.جهـ ژ دلا یێ تەنگە

13.جوامێرا گۆتییە: ستار ژ یا مێستر

## چ

1.چاڤێ ل دەری یا خوەلی ل سەری یا

2.چاڤێ ترسۆنەک سینگێ سپی نابینێ

3.چاڤێ شل ژ دلێ کولە

4.چاڤێ کول ژ چاڤێ کۆر چێترە

5.چاڤ کەڤرا شکێنن

6.چاڤ ل چاڤا دکەڤن،چا ل چا ناکەڤن

7.چایێ شنگالێ جهێ قرارا یە

8.چایو باب و برایو

9.چێر دچنە ئەسمانا ڤەدگەرنە خوەدانا

10.چیا چەند بلند بێ هەر رۆژەکێ رێ هەرێ

11.چ کەڤر ل کابا تە کەتی یە

12.چ با،چ باران ژ حەمرێ بەرفێ کێم دبە

13.چ ل هور دە چ ل تور دە

14.چریایو،دریایو

15.چلێ پشتی چلە مالێ بارکە سەر گرا

16.چەندێ مریشکە رەشە هێکە سپی یە

17.چەندێ ئاڤێ بکوتی هەر ئاڤە(پۆش ژی)

18.چەمچکا هەموو گرارا یە

19.چەند بترە چێترە

20.چ حەسەن کەچەل چ کەچەل حەسەن

21.چووک نکلێ خوە ل ئاڤی دە دکە و ل سەر خوەرە ل خودێ دنێرێ

# خ

1.خالا خوارزی راکرن ماما برازی ئێخستن

2.خال خەلکە مام ملکە

3.خواریو گەنیو دایو کەنیو

4.خوارن ب گەرمی شوغل ب نەرمی

5.خوارن یا هەر کەسیە مێرانی نا هەر کەسیە

6.خانییێ پیرێ خوەشترە ژ کۆچکا میرێ جزیرێ

7.خوارنە بێ ناموسە

8.خوارزی وەلەدێ خالانە

9.خێرەکێ بکە و بەر ئاڤێ دە بەردە

10.خێر هەموو نە نان و ئاڤن

11.خوەدێ دەریەکی ناگرێ یا یەکی ڤەکە

12.خوەدانێن مریا د کۆرن

13.خوەدێ دەلیلێ بێ دەلیلا یە

14.خوەدێ مە ژ نەبو و نەدیا بسترینێ

15.خەوا مریا تێ یا برچیا نایێ

16.خەو و کەو ناگەهن هەڤ

17.خوەزی ئاقلێ کورمانجا یێ تالی ل سەر من با

18.خەلفا ل سباتێ وەکە کەوێ رباتێ

19.خەسوێ سوارکن ئاڤا مەزن پی دەرباس کن

20.خوەدێ دایێ خوە نەکە تەڤایێ

21.خوەش میهڤانە لێ نەخوەش مازوڤانە

22.خوە نەدە بەر دیوارێ خوەهر

23.خەوا سباتێ وەکە ترێن پیرەفاتێ

24.خوەدێ گۆتیە: من ژ تفاقێ شەرمە

25.خوە دکە نێڤا سۆل و بزمار دە

26.خانیێ پیرێ ستارا پیرێ یە

27.خوەنە دەرەو ب کاڤراینە

28.خوەدێ هەڤالێ راستیێ یە

29.خوەدانێ سەبرێ بە میرێ مسرێ بە

30.خوەدێ دەرد داینە و دەرمان داینە

31.خێر ب لەز

32.خەو دەربە

33.خوەدێ گویزا ددە بێ ددانا

34.خدرلیاس سال خلاس

35.خوین نابیه ئاڤ

36.خوین ب خوینێ نایته شوشتن

37.خەون خەیالن هنەک دەست و هنەک دەرحالن هنەک بەعدی هەزار سالن

38.خدرلیاس لنگەک ل کانونێ یە و لنگەک ل سباتێ یە

39.خوینا مێرا لێکە ب دەینە

40.خدرلیاس قەدا و قوت خەلاس

41.خوەزی ئەز بوکا غەریبا بام دا من پەسنێ خوە بدا

42.خێر ل سەر هەفت دەستا دگەریێ

43.خێر ل شەر نینە

44.خوە دکە نێڤا مرۆڤ و کەراس دە

45.خەتا خوەهر ژ بن گایێ پیرە

46.خەمکا خەمایە

47.خوەدێ دکە مو و نا بزدینێ

48.خوەدانێ سالفێ ب کێفا خوە یێ یە

49.خوەنە بەروا قونا بزنێ یە

50.خوەدێ ددە هنا و ژ هنا دبە

51.خەملا دارێ پەلن

52.خوەدێ تاليا تە ژ پێشيا تە چێتر بكە

53.خەبەر هەكە دەركەت ژ زار وێ كەڤيە بازار

54.خوەدێ ب دلێ ساغ رەيە

# د

1.داس ژ دەستێ پەهلا نایێ گرتن

2.دارەک نینە با نە هەژاندی

3.داک و دۆتێ شەرکر،بێ ئاقلا بەهوەر کر(دۆت کەچە)

4.دار ب تەری تێتە تەواندن

5.دار ب زراڤی و ئینسان ب ستوری تێتە شکێناندن

6.دارا منێکا بەر ناگرێ

7.دار ب بەرێ خوە و مرۆڤ ب نانێ خوە

8.دار چەندێ بەر دگرێ سەرێ خوە تەوینێ

9.داکێ قەدایێ،خوشکێ بەلایێ،تەحلیشکێ ژنێ وەرە،کور ملێن منێ تە گەرینم ل دۆرا دنێ

10.داک مۆتکا کەچێ یە

11.دان کوتێ نەزانێ هەبا جهـ نیشانێ

12.داکا هەفت کورا ل بەر دیوارا ما

13.دارا تەهلە لێ پەلێ دارێ شیرینە

14.دیکێ قەنج ل هێکێ دە یێ قەنجە

15.دکوژێ و ب جەم تەرمێ وی دکەڤێ

16.دنیا ب دۆرا نە ب زۆرە

17.دل دشكێ بهلێ پیر نابێ

18.دزیێ خوه دا بهر قهحپهتیێ

19.دلداریا دلا ژ داینا دهستا ره كفشه

20.دلێ خوهش دیم لی بوهاره

21.دزی ههر دزی یه،چ هێكهك و چ گامێشهك

22.دلكا بار دكر،كزا بایڤ د چاندن

23.دنیا شار و مشاره

24.دوو ژن دیوانهكن

25.دل دۆستێ خوه ناس دكه

26.دنیا چهرخ و فهلهكه

27.دنیا دژمنێ كهوێ یه و كهو دژمنێ خوهیه

28.دنیا ملكێ خوهدێ یه و نه ملكێ كهسی یه

29.دیم قورمک  لبهر لێ نایێن

30.دنیا وێ ب نه لایقا مینێ

31.دزیێ زراڤ ل ناڤبهرا یێ یێ ب ئاقل و یێ بێ ئاقل ده نا قهتیێ

32.دنیا ژ هنا ره بهریه و ژ هنا ره ئاڤ و ههری یه

33.دنیا تارا بیژنگێ یه

34.دۆخا دنا یه

35.دراڤ نانێ پەهتی یه

36.دیلانا زانا ب نەزان دگەریێ(ئاش ژی)

37.دوو سەرییێن بەرانا د بەرۆشەکێ ده ناکەلن

38.دزێ ب زەنگله

39.دەستێ تەعبی لسەر زکێ تێره

40.دەستەکی بتنێ چەپکا ناکوتێ

41.دەستێ سەر خوارنێ ئی درێژه

42.دەستێ ڤالا،نه ئەهله و نه وەسەهله

43.دەستێ تو نکاربییێ براميسه

44.دەستێ نه ل گۆڤەندێ ئی نەرمه

45.دەستێ نێڤ ئاگر نەوەک یێ نێڤ ئاڤێ یه

46.دەستێ وی ل هەموو قولا دەیه

47.دەستەکی بتنێ ناچه سەر خوارنێ

48.دەستێ منۆ،کەسێ منۆ

49.دەڤ دئاخڤە،چاڤ شەرم دکن

50.دەڤێ خەلکێ نه تورکێ مرۆڤە،بدەیه

51.دەڤێ وی ژ شیر دشەوتی پفی دەو دکر

52.دەڤێ ریڤی نە دگەهشتنە تری دگۆت ئی ترشە

53.دەڤێ پیڤاز نەخواری بهن ژی نایێ

54.دەنگێ دهۆلێ ژ دور ئی خوەشە

55.دەولەتا بلەز،پەز و رەز

56.دەوێ جەرباندی ژ ماستێ نە جەرباندی چێترە

57.دەرەو ل مریا دبن،ل ساخا نابن

58.دەلالا دەلال نەکن یان وێ قەحپ بن یان پیس بن

59.دەما داک دمرێ باب دبە مام

60.دەردێ کەزەبێ ل سەر سوارێ نەقەبێ

61.دەرەوکا خوە بکە و شاهدەکی خوە راکە

62.دەرییێن خێرێ نایێنە گرتن

63.دەولەت سەرێ خودێ یە

64.دەمێ درونێ،درونێ

65.دەم ب دەمێ رە و هەموو ب خوەدێ رە

66.دەردێ سێویا گرارە

67.دەوسا خنجەرا دچە،یا پەیڤا تال ناچە

68.دوور ب نور

69.دوور هەرە و درست وەرە

70.دویٚ ریڤی شاهدیٚ ریڤی یه

71.دوهنیٚ مه ل سەریٚ مەدا

72.درا بدنه در ناسا

73.دۆستیٚ بابا نابن دژمنیٚ کورا

74.دوا ل پارییٚ هادره

75.دنیا واره نه ماله

76.دەرییٚ خوه بگره،جیناریٚ خوه دز دەرنەئیٚخه

77.دوییٚ کوچک راست نابیٚ

78.دنیا گوله هەر وەخت  رەنگەکه(پەیڤ گوله نابیٚ دیم بەر بهنا یەکی بیٚ)

79.د لۆمینیٚ نا دۆمینیٚ

80.دبیژیٚ،نا پیژیٚ

81.د سەبریٚ و نا بوهریٚ

82.دووبشک گۆته مار تو پی ڤەده ئەزیٚ خوه رایکمیٚ نامریٚ،ئەزیٚ پیڤەدم تو خوه رایکیٚ ویٚ مریٚ

83.دیکیٚ خوه ل سەر قەسریٚ سەرژی دکه

84.دنیا هەموو ب ئاقلیٚ خوەی رادی یه،کەس ژ مالیٚ خوەی رادی نینه

85.دژمنەکی شەهرەزا،نه دۆستەکی بیٚ ئاقل

86.دارا بێ پەل خەلک کەڤرا نا ڤێژتێ

87.دەف هاتە پۆل،پۆل ب دەست نەکەت

# ر

1.راستی ریا خوەدێ یە،درەوین دژمنێ خوەدێ یە

2.راستی ل ناڤ ئاگر دە نا شەوتێ

3.رۆژەک وێ ئێ هەفت ژن وێ بازدنە بتنەکی ژا وانە مێرەکە

4.راستی یە تەعلە

5.راستۆ درستۆ خوارۆ پشت شکەستۆ

6.ریڤی نەدچوو قولێ هەچکەک ب دویێ خوەڤە دکر

7.ریڤیەکی گەرۆک چێترە ژ شێرەکی شداندی

8.رۆژەک وێ ئێ حەیب نامینێ  روییێ بوکا و خەو چاڤێ بچوکا

9.رۆژا چوو ڤەناگەریێ

10.رەش کە و دلێ خوەدان خوەشکە

11.رەحمەل گۆرا وندا

12.رۆژا خوەش ژ سبێ دە یە خوەشە

13.رم ل تۆرا دە نایێن ڤەشارتن

14.رونشتن نە داکە و نە بابە نابیژیە تە رابە

15.رەز شەوتی سڤۆک ل دەوسێ دە هات

16.ریا ببرە و نە رسقا نەبرە

17.رهـ دبه بۆست و دژمن نابه دۆست

18.رونیێ ژ ئاخێ یه

19.رسقێ سەرێ سبێ یە(رسقی ل خوەدێ یه (

20.رەیا ژ بنڤه قوت دکه

21.رۆژەک وێ ئێ ئاڤ نامینه ل سەر کەهنیا

22.رۆژەک وێ ئێ دنیا وێ ل هەڤ
کەڤێ،سونەتخان،ئێزدخان"وێ ل خوه ب شک کەڤێ

23.رۆژەک وێ ئێ موحرکێن قول ب هەتارا ره نامینن

24.رۆژەک وێ ئێ دنیا وێ بیه یەک مەسەب(ئای)

25.رۆژ دبیژه خوەزی جارەکێ من هەیڤا 14 شەڤی پێشبەری
خوه بدیتا

26.روحێ وی/ێ هات سەرێ کەپۆ

# ز

1.زارۆک خەو کێڤریشکی نە

2.زارۆک ب هەفت رەنگا دگوهەرن هەتا مەزن دبن

3.زارۆک زنارن

4.زارۆک سەبرا مالاینە

5.زارۆک د وەکە جەرۆکای نە ما ریڤی ل دوو بکنە خوشە خوش نزانن

6.زکێ تێر هاژی یێ برچی نینە

7.زمانێ تە بەلا سەرێ تەیە

8.زمان دوو کەهنینە یەکە تالە و یەکە شیرینە

9.زمانێ گرتی قەلەما زێرینە

10.زکێ برچی تێر دبێ بەلێ چاڤێ برچی تێر نابێ

11.زک زکاکە ت چ بکیێ دەنگ ناکە

12.زلامێ بێ دوندا وەکە دارا بێ بەرە

13.زارۆک وەکە کاخەتەکا سپی نە

14.زاڤایێ لبا خەس و خەزورا وەکە کوچکێ ل بەر تەنورا

15.زێر ژی ئی هورە

16.زێرا باڤێژە زکاکا هەر کرۆش وێ ئێن ل ماکا

# ژ

1.ژا بەرگیرێ یە هەکە برچی بوو تێر نابە و هەکە تێر خوار هەوا برچی نابە

2.ژا دزایە دنیا هەموو ئا دزە

3.ژ دلۆپێ دبیە گۆل

4.ژ ئاڤا هێدی بترسە نە ژ ئا حێل

5.ژ بەر شرکێ چو بەر مزریپێ

6.ژ هنەکا رە عەدەتە و ژ هنەکا رە قەبحەتە

7.ژەعر ژ مارا خەلاس نابێ

8.ژ سەد تۆکلی یەکە خەرابە

9.ژیری ژ شیری هەتا ب پیری

10.ژ خەلکێ رە لوقمانە ژ خوەرە بێ دەرمانە

11.ژژۆ دبێژە: تیشکێ من چی نەرمە

12.ژ وی بترسە ئێ ژ خودێ نە ترسێ

13.ژ دینا رە هەرۆ دەهوەتە

14.ژ شیر کر ل سەر کیر کر

15.ژی کەتۆ پی کەتۆ

16.ژ منۆ ل منۆ

17.ژ شیرەتێ دینا و پیسا خافل نەبە

18.ژ  تە حەرەکەت و ژ من بەرەکەت

19.ژ دنێ رە نان و ژ ئاخرەتێ رە ئیمان

20.ژنا باش ستونا مالێ یە

21.ژنا خەراب بەردە،مێرێ خەراب دەردە

22.ژن ژ سەرگوهـ و بەخت ل خوەدێ

23.ژن هەنە و ژنکۆک هەنە(مێر هەینە و مێرکۆک هەینە)

24.ژن دمرێ مێر ژار دبێ،مێر دمرێ ژن هار دبێ

25.ژنا قەنج سەیدە،ژنا خەراب قەیدە

26.ژنەبی ب فەنن بەر پشتێ وان تژی کاخەت و بەنن

27.ژن بابێ کافر بابێ

28.ژنا مێرا بە نە تێرا بە

29.ژن هەردەم ژنە مێر هەردەم نە مێرە

30.ژن بەنێ هەبانا یە

31.ژ خاسا نا گەهیە ناسا

32.ژڤر هەتا ب ئەسمانا دەستێن سەر دەستارە هەینە

33.ژن کەزەبا رەشە

34.ژ نەفسا کەتە حەبسە

35.ژ گەیایێ بوهارێ هەموێ نە تۆلکە

36.ژ گێرک و مێروا بتر نا سەکنێ

37.ژ سیها خوە ترسێ

38.ژ سەد سوهری چاڤ هشین یەکی قەنجە

# س

1.سال ب سال خوەسکە ب پار

2.ساڤارێن ئەیلونێ ژێ تێ تاما رونێ

3.سالەکە و جارەکە

4.سەقە و گورە لەقە( د مرۆڤێن وەک یەک بگەهن یەک)

5.سەبرێن خوەدێ خێر ژی چیدبن

6.سەرێ نە ئیشێ نە هەوجەی گرێدانێ یە

7.سوارێ خەلکێ هەری پەیایە

8.سعودا مێر ب ژنێ رەیە

9.سەرێ کەچەل ل بن کوم دە ئی قەنجە

10.سیتلێ گۆت بنێ من زێرە هەسکۆ گۆت نهو ژی هاتم

11.سەر قوچە و بن پوچە

12.سەر هلوا مال ب گو

13.سوارەکی ب تنێ تۆزێ راناکە

14.سوارا بگرن پەیا هەر یێ وەینە

15.سەرییێن برین نایێنە کرین

16.سێنیکا شکەستی چێترە ژ ئا خوەستی

17.سەرێ شەری خوەشە و بنی رەشە

18.سباتێ بەرف و باتێ

19.سەرگوهـ نادن سەر بانا

20.سموقی جغارا ل بن ئاڤێ دە ڤەدخون

21.سباتێ پسیکێ کرە واتە واتێ

22.سەد عالم و ئینکارەک

23.ستونا قەنج بدە بەر خانیێ خوە

24.سەد گۆتن قوربانا کریارەکێ بن

25.سەر تلی ب وردە پشت پەحنێ ب ڤردە

26.سەرێ چەند شاخا دبە نەوالەک

27.سبات گەهـ دکەنیێ و گەهـ د گریێ

28.سێ تشت هەنە نعمەت،پەز،رەز،حورمەت

29.سێ تشت هەنە دل ئێش،متری،مریشک،مێش

30.سێ تشت هەنە بێ بەهوەر،مار،ئاڤ،ئاگر

31.سێ بێ ئاقل هەنە ل دنێ،مێرێ ل بەر حوکمێ ژنێ،ئەوێ دچە رێکا بتنێ،ئەوێ ژ حالیا بکێشێ توتنێ

(کورب)

32.سەرێ وی ل جوهارێ هەڤالا دەیە

33.سەریێ بێ ئاقل وەکە گوزا بێ کاکل

34.سەری نە ئیشێ کوندرەک ژی چێترە

35.سەد پەز خوە ددە بەر سیها دارەکێ

36.سلاڤ سلاڤا خوەدێ یە

## ش

1.شام ب ناسین

2.شاهینا هەسپێ ژ بنارا وێ تێ

3.شوغل بکە ژ ئەساس دا دلێ تە نەکە واسە واس

4.شوغلێ ئیرۆ نەهێلە سبە

5.شوغلێ ب خەلکێ وەکە ئاڤا ب سەلکێ

6.شوغلێن بێ دەلیل نەکە دا دەردێ بێ دەرمان تە نەکەڤێ

7.شوغل شێرە هەکە تە دەست ئاڤیتێ دبە ریڤی

8.شوغلێن کچک مەزن نەکە

9.شوژن ب فەن تێ قول کرن

10.شوشتن رەنگ و روو،خوارن گەند و گوو

11.شوغل کارێ خوەبە شێرینێ بەر دلێ خەلکێ بە

12.شوژنا ل چاڤێ خەلکێ دە دبینێ دەرزیا ل چاڤێ خوەدە نابینێ

13.شەرێ سبەهێ ژ خێرێن ئیڤاری چێترە

14.شەرێ چووکا ل سەر گارسێ مەیە

15.شۆڤا کانونێ وەکە دەولەتا قانونێ

16.شەرت شۆڤە نە تۆڤە

17.شێر دمرێ چەرم دمینێ،مێر دمرێ ناڤ دمینێ

18.شەکۆ بەکۆ ناڤێ خوە ل هەڤالێ خوە کۆ

19.شەر کێشو قەدا ل پێشو

20.شێر شێرە چ مێ و چ نێرە

21.شیڤا دوو کەبانیا یان شۆرە یان کێم خوێ یە

22.شڤ ب تەری دبیە گوهپال

23.شیر کەڤالێ خوە نا درینێ

24.شڤانێ پیس ژ گور خەرابترە

25.شرا شرا ئاڤێ ئەز برم بالێ ژ تیهنا مرم

26.شیرەتا بوکێ و خەسوێ یە

27.شیرێ هەڤیێ ل نێڤ چاڤێ برایێ ئاخرەتێ بدە

28.شێخ ل رێ و مرید ل پێ

29.شێخ و پیر گولیێ دارەکێ نە

30.شێور ب خێرن

# ع

1. عەزیما قولنگ و رۆڤیە
2. علم بەحرە

# غ

1. غەزالا تی بەر ب ئاڤێ غارە
2. غیرەت ژ ئیمانێ یە
3. غەزال دبەزێ و نابەزێ ژ غەیری رسقێ خوە ناخوە
4. غێنجی جلکا خوە ژ ئاڤێ دەرتینم
5. غەریب بەنکیێن بێ گرێکن

## ف

1.فەنێت مێرا کەلەهن

2.فەسال ژ سۆندێ چێترە

3.فیدا گاڤان سواربوونا کەرێ یە

4.فیدا مریشکێ هەتا ب کادینێ یە

5.فیلێ پیر بسلمان نابێ

6.فکرێ شێخ چبە،زکرا ویژی ئەوە

## ڤ

1.ڤی ناڤی ڤێ گاڤێ

2.ڤان دارا ڤان هنارا نە مە دەرە نە جینارە

3.ڤی هەڤیری گەلەک ئاڤ هلگرت

4.ڤەیە دار ڤەیە مشار

# ق

1.قەساس ل قیامەتێ ناچە

2.قونا خوە رای زاروا بکە نە دەڤێ خوە

3.قەهری بنڤە و پۆشمان نەنڤە

4.قەلی ژ سەرێ چوکا چێ نابێ

5.قەولێ مێرا سێ جارن

6.قاری ماری هەموو بونە باژاری

7.قورک هلات گوریا گەرمێ چوو

8.قەنجی ژ قەنجیێ چێدبێ

9.قەنج کرۆ ب خوە کرۆ پیس کرۆ ب خوە کرۆ

10.قیزانی گەلەک خوەشە،بوکانی گەلەک گەشە گاڤا کەتە بەر
قەهرا مال رۆژا رەشە

## ک

1.کاخەتا سپی نایتە خوەندین

2.کایا کەڤن نە دیرە

3.کانوونا کچک بەرف هات پیچک پیچک

4.کار ل هەفتە بەخت ل چەفتە(خوەهرە)

5.کارین نەبوەکێ بکن هەسکۆ لی نەگەریێ

6.کاروان د مەشیێ و کوچک د رەیێ

7.کەڤرێ گران ل جهێ خوەدە ئی قەنجە

8.کەڤرێ کچک و مەزن ب ئێک د سەکنێ

9.کەس نکارێ وەکە دەستێ تە پشتا تە بخوەرینێ

10.کەچک نەینکن

11.کێ خێر کر مالا خوە تێر کر

12.کەرۆ نەمر هەتا قیڤار تێ

13.کەس ژ رۆژا خوە دەرباس نابێ

14.کەن ژ دلێ گەش تێ

15.کەهرکێ دەڤ ئاڤیتە گوهێ بەرخکێ و دکرە قیرین

16.کەر هەر کەرێ بەرێ یە لێ کورتان گوهەرتن

17.کەهرکێ یەکی مر کوچکێ جیناریێ وی پی قەلەو بوو

18.کەس نابیژێ دەوێ منی ترشە

19.کەس ب خوەزیا ناگەهیە باغ و کەزیا

20.کەچ کەزیا داکێ د ریسێ و کور یا بابێ

21.کفری،چێر،خەبەر،باینە

22.کەن و گری بەهرا مری

23.کێسکێن چالا بونە کەبانیێن مالا

24.کۆدا ڤالا دەنگ ژی تێ

25.کەڤرێ بێ سعودا ل بنێ گوهە

26.کەر ژ کەرا د حەلمن تر و فسا

27.کەچ وارێ خەلکێ نە

28.کەبانی ژ تلیا خوە تێرە

29.کەرێ وان ل کۆرێ وان نا سەکنێ

30.کەس ناکەڤیە گۆرا کەسی دە

31.کەو وەلاتێ خوە ژبیر ناکە

32.کەچ گویزا نا شکەستی یە

33.کەچ سەرگوهـ،هەرۆژ هنە تێیە سەر

34.کومێ وی ژ راستیا ئی خوەهرە

35.کەچەل کومێ کور دڤێ و کوم درابێن هور دڤێ

36.کەچکا ب کەزی و کوریێ وەکە میهەکە مێشین

37.کەر ب کەرینیا خوە هەکە جاکێ کەتە کۆرەکێ جارا دی بەرێ خوە ژی د گێرێ

38.کەرەم رابوو،سنەت هات

39.کەس ب لەزێ ناگەهیە مرازێ

40.کوریێ کورا کاکلکێ نێڤا کاکلا

41.کوچک هەستیا دخوە،حەسابێ قونا خوە دکە

42.کوچک ب قوساندنێ نابە تاژی

43.کوچک گۆشتێ کوچک ناخوە

44.کوچکێ مەیە ل بەر دەرێ خەلکێ د رویێ

45.کێ خوار و کێ ل خوەدا

46.کولیەک ل زەڤیێ دە گەلەکە

47.کومێ ڤی ژی دکە و ل سەری ڤی دکە

48.کوریێ قەنج برایە ژ باب رە

49.کور نانەکە و باب یەکە

50.کۆچا نەزانە ئا شەپرزەیە

51.کی بوویە ئەو بەربووکە

52.کینا تە کینا پەلولێ یە

53.کێ دنیا کەرۆت یێ کری و فروت

54.کچکێ مالێ کوچکی مالێ یە

55.کرکا خوەدێ قول کری وێ رسقێ وێ شینێ

# گ

1.گاڤان بەر ب مال بوو،ژنا وی شوغل کار بو

2.گاڤا مترب برچی دبە داوەت  ب بیرێ تێن

3.گالە گالا شڤانا،مالمیراتیا مازوڤانە

4.گارس گول بوو باران هات و شل بوو

5.گازن ژ کور، گۆ ژ جهێ رەجوێ

6.گۆتنێن بەریا نەخشێن سەر کەڤرانە نە ئاڤ د شۆیێ و نە رۆژ د حەلینێ،هەر و هەر دمینێ

7.گۆ بلا هەبە،بلا کورێ کەرێ بە

8.گۆلکەکی ریخۆکە گارانەکێ ب خوەرە خەرا دکە

9.گۆتنێن ئیڤارا دکەڤنە قولێن دیوارا

10.گوهێ خوە بدە علم نە عالم

11.گۆت هەسپێ بابێ من خوە هەفت رما گۆت ئەڤ هەسپا بابێ تەیە  و ئەڤ تاڤیت مەیدانە

12.گۆتنە پسیکێ گویێ تە دەرمانە رابوو ئاخ دا سەر

13.گۆت کێ چاڤێ تە دەرخست گۆت مرۆڤێ من

14.گۆلا پرِا ئا غەرقی یە

15.گۆتن تو ژ کوری؟ گۆت: هیژ ئەز نە زەوجی مە

16.گوزێن خوە ل سەر دلێ من د شکینێ

17.گۆ هەکە ژ تە نایێ توو ب جەم خودان سعودا بکەڤی ل وارێ وان دەینە

18.گۆ یەک چوو گوندەکی هەموو ب چاڤەکی بوون،وی ژی رابوو چاڤەکی خوە دەرانی

19.گۆ هەکە سعود چوو ژ بالە هەکە پەیفت متقال ب متقالە وێ بیژن پەیڤا ڤی چا تەعلە و هەکە سعود

هاتە سەری هەکە زریا وەکە کەری وێ بیژن تەڤی چوانی و تە ڤی سەری

20.گۆتیە رابە و ئەز ب تەرە

21.گولانێ دل کول کر ژ کول و کۆڤانێ

22.گوهەکی بکە سەراد و یەکی بکە بیژنگ

23.گولانێ چنگینا داسانێ

24.گور عەیارێ خوە نا گوهەرێ

25.گیسکا گوری ڤەناخوە یا ژ سەرێ کەهنییێ

26.گیسک ب دزی نێری دخوە و ئاشکەران ددزێ

27.گرارا ب زوخرە

28.گرێکا ب دەست ڤەبێ ب دەڤ نەچێتێ

29.گرێکا خوە ب پشت هێچک ئێخست،ڤێجا هەوە

30.گەرار مێرا ب حەمدێ دکەلێ

31.گەیایێ حەوشا ئی تەعلە

32.گەیا ل بن کەڤر دە نامرێ

33.گەیا ل سەر کۆکا خوە شین دبێ

34.گێرە ب گۆلکا نابێ

35.گەنم بێ زیوان نابێ

36.گۆت: ئێ ل سەرێ مللەتێ من کرە فەرمان ئەزێ ل سەرێ وی کمە ئاخر زەمان

37.گۆ رۆژەک وێ ئێ خەسوو ب بوکێ وێ شێورێ

38.گۆ تیتی لنگێن خوە بەرو ئەسمان دکە،دبێژە هەکە ئەسمان کەت دا ل سەر لنگێن من ب سەکنێ

39.گۆتنا درێژ مرۆڤ دکە گێژ

40.گا دچە چەرم دمینێ و مرۆڤ دچە ناڤ دمینێ

41.گۆر هەیە سەرانسەر و گۆر هەیە بەرانبەر و گۆر هەیە خوەلی سەر

# ل

1.لێڤ ل  پێش ددانایە

2.لنگێ خوە وەکە جلکا خوە باڤێژە

3.لی نێرینا چاڤا قنیاتا دلایە

4.ل پایزا هەوا خوەشتر بوو ل دێلیزا

5.لێ هاتن ژ ژێ هاتنێ چێترە

6.ل نێڤا خدر ئەلیاس و خدر نەبی ژ نێڤا مال و مال خافل نەبی یان کفنێ تە ل بنچەنگێ تەبی

7.ل پایزا ڤەکن دەرێ هیزا

8.لانگا هاژی دەنگا نینە

9.ل سەر گەلەک ئاڤا رە بازدایە

10.ل سەر مالا هێل هێل نەکە یا ب تە نەخوەش ب هەڤالێ خوە نەکە

11.ل سۆلێ هەسپا خوە بنێرە،پاشی درێژیا رێ بزانبە

12.ل ناڤبەرا گۆتن و کرنێ دە چا هەنە

13.ل پی تەنگیێ رە فرەهی نە

14.ل کاخەتەکا پەرتی دگەریێ

15.ل نیر دده و ل بزمیر دده

16.ل ئەسمانا خوەدێ یە و ل ئەردێ حکومەتە

17.ل با جهوا بخوە و ل با فلا بنڤە

18.ل دەستا و ل بازندا،ل گولا ل سۆسنا،شەڤ شەڤێن دەهلێنە ژن ژنێن خەلکێ نە

19.ل دنێ و ئاخرەتێ ئی رو رەشە

# م

1.مار یا خوه راست بکه ناچه قولا خوه

2.مار نه جهه و نه واره

3.مار ژ پونگێ د قەعەرێ ل دەرێ قولێ دە هات

4.مار گەستی ژ وەریسا ژی د ترسێ

5.مارێ ژ وی واری بعدی هەزار سالی وێ ڤەگەرێ قولا وی دیواری

6.ماسی ل سەرێ دە گەنی دبت

7.ماسی ل **گۆلا** دە مەزن نابت

8.ماسیێ دەڤ گرتی ناکەڤە تۆرا نێچیرا

9.مالێ دنێ قرێژا دەستا یە

10.مالا بێ سەمیان وەکی دەردێ بێ دەرمان(سەروەت)

11.مالا هەکە مەزنەک تێدە نەبت کەڤرەکی مەزن دەینێ

12.مالێ ئاغا دچە سەرێ غولام د ئیشێ

13.مالێ مریا یێ زندیایە

14.مالێ دنێ یان ئێ حەیفایە یان ئێ کێفایە

15.مالا بوو ژن خەرا بوو ژ دن

16.مالا مێرک مالا حەڤە مالا بابێ تەڤە تەڤە

17.مالا نو ماله دەست ئاڤیتە کۆڤلێن مالا ژا وانە قەتک و وەریسێن وێ پێ چنە دارا

18.مالا مێر تیدە کەهنیە زێر تیدە

19.مالا بابا زیارەتن ئاڤا جەرێن وان شەربەتە،داک هەکە دمرن زەری هەکە دتێن ل با برا بێ قیمەتن

20.مالێ سەلەفێ با دبە و باران دشۆ

21.مالێ ب نیڤی ژی نەکە هیڤی

22.مالا با ل بنرە دەرباس دبە نە مالە

23.مال ل ملۆ یە

24.مالا زەهف بەلا سەرێ خوەدانە

25.مێر کیلا خوێ دخوێ

26.میهڤانیا قولنگ و ریڤی یە

27.ما دوو سەری وەکە یەک ناچنە سەر جەمکەکی(بالگوهـ)

28.میهڤان ب خێرن

29.میهڤان رسقێ خوە ب خوەرە دئینن

30.میهڤان میهڤانێ خودێ یە

31.من توو ل ئەسمانا د خوەستی تو ل ئەردا ب دەست من کەفتی

32.مرۆڤ ب زمانێ خوە و حەیوان ب لنگێ تێ گرێدان

33.مرۆڤێ ب ئیمان وەکی گەمیا ب خودان

34.مری ڤەناگەرێ ب گری

35.مرۆڤ چ قاس پیر دبە بتر دنیا پێ خوەش دبێ

36.مریشکێ چاڤ ل بەتێ کر قون دەرکەت(وەردەک)

37.مرن ژ پەریکێن چاڤا نیزیکترە

38.مێش خوە ل دەوێ تیر دگرە

39.من پیس ئاڤیت قەنج کەت

40.مرۆڤێ برچی وەکە گورایە

41.من بیریا تلیا خوە نەکرییە

42.مویا ژ مارا د قوسینێ

43.مرن ئە تەعلە

44.مرن ئە سارە

45.مێر ب موو و ژن هلو

46.مەیرا روهن ژ کێم دەهنی یە(گرارا روهن ژ کێم دەهنی یە)

47.مێر مالێ تینێ ژن وەرتینێ

48.مەحبوب ئەوە دل ب حەبینێ

49.مەندێ خەلیلە بێ پابوو ژ هەردوو عیدا

50.مێرا ژ دیتنێ باوەرە

51.مەشکا ل رێ دە هەچییێ هات و حەنەکەک لێدا

52.مار ما مار بخوە نابە زوها(مەزن و دژوار)

53.مە بووک ئانی ب لەز و بەز سڤکا مالێ دیسا ئەز

54.مرۆڤێ بێ وار وەکە تەیرێ بێ چەنگە

55.موو ل زمانێ مندە هاتن(سەرهشکە)

## ن

1.نان پیژێ تیرک دریژێ(تیرک،دارێ راستکرنا نانێ سیلێ یە)

2.نانێ گەرم نەی تسی یە

3.نا خوەیە نا هەڤالە بویە کەڤانیا دوو مالا

4.نانێ سیلێ یە نە بەرە،نە پشتە(نیسکە نە بەرە،نە پشتە)

5.نانێ وی ل سەر چۆکێ یە

6.نانێ دەریا کەتییە زک دە

7.نفر شیرێ دوو دەڤە خوەدێ زانێ ل کێ دکەڤە

8.نانێ پەهتی وەکە سلتانێ سەر تەختی

9.نان ب روێ خوە تێ خوارن

10.نە قوب هەموو زیارەتن و نە روهـ هەموو سورەتن

11.نانێ مێرا لێک ب دەینە

12.نانێ خوە بخوە ب ئاڤێ،نمەتا خەلکێ باڤێ

13.نانێ خوە بدە نان پیژا بلا نانێ تە زیدە چە

14.نانێ تە وەکی ل سەر سیلێ رەش بوویە

15.نانێ پیسا ئی پەهتی یە

16.نان قوتێ ئیمانێ یە

17.نه مالێ پر،نه ژنا ژ خوه تر

18.ناڤەکی گرانه و شارەکی وێرانه

19.نەهک چوون باژار بوون لەبلەبی

20.نه ل رەنگێ تتونێ هەره نه ل چولێ مێرا

21.نه ماره ب ئاخێ بعەیشێ

22.نه سار لی تێ نه گەرم

23.نوبەرێ تره دۆرا گره

24.نه زەر بوو و نه دەر بوو

25.نه بیژه عەرەبا مەرحەبە

26.نەرمکا نه لڤین تێ عەجێبێن گران بینی

27.نێڤا ئێزدیان و فلا مویەکه

28.نێڤا ژن و مێرا بەحره

29.نه هەر تشتێ ژەنی زێره

30.نفرێ خوه دا بەر ئەفرێ (ئەفر،ئافراندن،نەبوو)

31.نه گەلەک شیرین به ته بخون و نه گەلەک تال به ته باڤیژن

32.نه ئەو تاسه و نه ئەو حمامه

33.نەزان وەکه دارا بێ پەلن

34.نەزانی رەحەتیا جانی

35.نه بخێرێن خوه ژ خوه رادی ببه و نه ب گونههێن خوه بترسه

36.نهدیتی و دیتی بخوهده ریتی

37.نه سوحرا ل بهر ئاگرا،نه رندا ل بهر چرا

38.نه مالێ ب فهنا و نه کورێ ب کاخهت و بهنا

39.نه جڤاتا ژنا و نه بێریا بزنا

40.نهفسا قونێ و دهڤ یهکه

41.نه عهورێ گورگوری و نه مێرێ تر تری

42.نێرگزێ حهیا سزێ ته نههێلا بوهار بزێ

43.نهخواری ب سمبێلا ڤه چووی

44.نه دهنگ کری بن زێره

45.نهچه ور یهکی ته تی نهبێ

46.نه ئهسل کل و کلدانه ئهسل تهشی و بادانه

47.نه گوندێ بێ رهز و نه کۆنێ بێ پهز و نه زلامێ بیژێ ئهز

48.نه بهلهنگازهکی پۆز بلند و نه میهڤانا مال ل گوند و نه زلامێ ل جڤاتا بیژێ ژنا منا رند

49.نه مرنه را لی نابێ

50.نه عهرهبێ ب هشینییێ کهتی و نه بهلهنگازێ ب دهولهتێ

51.نه ژنا گهرۆک و نه مێرێ پت پتۆک

52.نه خوەسکا من ب وی بێ دەربەکێ دەینێ،زرپەکێ هلینێ

53.نیسان دبیژێ ئەز بوکا سالێ مه

54.نکاریه کەرێ دچه کورتان

55.نزانێ دیلانێ دبیژه ئەردی خوەهره

56.نیسکا ناڤێژه دەوسا کزنێ و بەرخێ بەر بزنێ و مالێ نەبه جەم مالا بابێ ژنێ

57.نه کەر کەتیه و نه هیز دریایه

58.نێرگز نه بوهاره دارا خۆخێ نه داره ژنا بێ مێر نه ت یاره

# هـ

1.هافا بێ ئەسلایە(هاف=رۆژا وانە)

2.هاژی بایێ فەلەکێ نینە

3.ها دار بر ها سەر بر

4.هاڤینێ ژی رۆژێن سار هەینە

5.حوکمی حەکیمە

6.هەکە شام شەکرە وەلات شرینترە

7.هەر ژنەک وارەکە

8.هەکە تو خێرەکێ بگەهینی نەبێژە ژ چ دینی

9.هەسپەک و قەسپەک لبا یەکن

10.هەکە شریکانی یە قەنجە نهو خودێ ب شریک بوو

11.هەڤالەکی لنگێ چەرخی نینە

12.هەچێ تەعبێ وێ لەعبێ

13.هەکە ئا خودێ هات ئا عەڤدا ئە بەتالە

14.هەکە هێوی مێشە هیژ دلێ من ژ بەر تێشە

15.هەکە ئا کچک سەرگینە هیژ ل بەر دلێ مێرک شێرینە

16.هەزار دۆست نە گەلەکە دوژمنەک گەلەکە

17.هەر گوندەکی مالەکا خوە تی ئاڤاکە

18.هەکە گا کەفت کێر د زەهڤن

19.هەکە دزی ژ مالە بەرگرتنە بەتالە

20.هەچێ نە ژ مالەکێ نزانێ ب حەوالەکێ

21.هەکە ئاڤ ل گۆلا دە ما بیهن ژێ تێ

22.هەکە خودێ دا یەکی نابیژێ کورێ کێی

23.هەکە ب دەنگێ بلند با وێ کەر موختارێ گوند با

24.هەکە عەجەلا بزنێ هات نانێ شڤان دخوە

25.هەکە خودێ ئا مێروێ تینێ پەرا پی تینێ

26.هەچێ چوو ماسیا قونێ شل بێ

27.هەکە ن ژ فەسادا با میهـ و گور وێ ب هەڤرە چەریان

28.هەکە تە گرت بەرنەدە و هەکە تە بەردا ب دوو نەکەڤە

29.هەکە ددوا کرە تەبایی کارن چیا دانن سەر چیایی

30.هەکە کورمێ دارێ نە ژ دارێ با دار خەرا نەدبوو

31.هەکە من هەزار وەریس چێکر وێ هەزار هەچکی پیڤەکە

32.هەکە پەیڤە ل رویە گونهی عەفوویە

33.هەرە سەر هەویێ نەچە سەر سێویێ

34.هەکە دراڤ کەتە کورتانێ کەرا د زرن

35.هەکە کورمانجی تێرە خەو ژێرە خێرە

36.هەرۆژ مری وەریسەکی دوری مال دکەڤە

37.هەکە مالا بابێ گاڤەنە زەیە ژی رەجو گرانە

38.هەکە مە پەز نەدیە مە بشکول دیتنە

39.هەیڤا رەش رۆژ نەما گەیا نەما پۆش

40.هەکە سوار سوار بوو حزن بەتال بوو

41.هەکە چوو ئێ خەلکێ یە هەکە هات ئێ منە

42.هەبیبی نەجار سەرێ خوە دەینە وەکە هەرجار خوەدێ یەکە و فەرەجی هەزار خوەدێ مێسترە ژ

شاهـ و خوندکارا.

43.هەکە چوو ب قەیدک و مربەتا نا سەکنێ هەکە هات ب دەزیەکی خاڤ تێ

44.هێسن ب ساری دکوتێ

45.هەر سالەک حەمرەکە

46.هەتانی نانێ مرۆڤ ل تورکێ خەلکێ دەبێ مرۆڤ تێر ناخوە

47.هەر کەزی زەرەکێ سمبێل سۆرەک لبەرە

48.هەکە مێری چاڤ ل دەری ژن یە خوەلی سەری

49.هەکە مسر خەراب بوو عەرەب هەموو نکارن ئاڤا بکن و هەکە دەولەتێن عەرەبان هەموو خەراب

بوون مسر كارێ ئاڤا بكه

50.هەكه دكاندار مفلس بوو دەفتەرێن كەڤن دەرتينێ

51.هەدەر هەر و هەر

52.هێسترێ چاڤا لێک ب دەينن

53.هەكه شێخ بوو ئاڤ نەدە ناڤ

54.هەردوو دزێن قولكێ نه

55.هەدەر ل بەر مقەدەر نابێ

56.هەسپ نينه ئالف چێدكه

57.هەچيێ گەلەک دا بەر داسێ وێ مينه ئاسێ

58.هەچيێ پر كر كەزيێ خوه كور كر

59.هەتا ديكێ سبەهی بان دكه دنيا ب خێره

60.هەڤالێ مريا كەڤر و دارن

61.هەكه نەزان بوونه رێزان مەدەد ژ دەستێ وان

62.هژدەی كانونێ رۆژێ بەرێ خوه دا هاڤينێ

63.هژدەی ئادارێ رۆژێ بەرێ خوه دا بوهارێ

64.هەكه دەستێ تەی درێژ به بلا زمانێ تەی كورت به

65.هەكه ل پيش بوكێ نەهات ل پاش بوكێ نايێ

66.هێک ب خوێ و خوێ ب تام

67.هەکە دێلکە ب سەی یە،سەی ژ بەغدایێ یە

68.هەر گولەکێ بهنەک ژی تێ

69.هەکە تە بارەکی گویزا لی کر خشتین ژی نایێ

70.هەکە تە بڤێ ژنا تە وێ بیە دار قون و هەکە تە بڤێ وێ بیە خاتوون

71.هەر بەرخ وێ چە بەر مەهکا خوە

72.هەکە ژ دەڤێ گو هـ گەهشتێ قەنجە

73.هەر مال بارکرنەک مال خەرابکرنەکە

74.هەسپێ ژ دەولەمەندا ب خوازە و ژنێ ژ بەلەنگازا

75.هەکە ل هیڤیا بم هەر ئەزێ ئەڤ بم

76.هەکە ت بوی بەگ و پاشا ل مللەتێ خوە نەکە حاشا

77.هەکە ئاڤێ ژی ت بری ل سەر بیرا پیسا دەرباس نەبە

78.هەکە گۆت هۆش هۆشە هەکە گۆت چوو چوویە

79.هەکە لڤی لێڤە ئەز زانم چ ل دێڤە

80.هەکە قولپکێن بهارێ کفش کرییە وێ کفش بێ

81.هەفت مالا کەراس شۆیەک تێر نە دکر

82.هەکە دەشتە و هەکە زۆزانە روحێ پەز شڤانە

83.هەکە تی ب شۆڤی تی ب تۆڤی

84.هەکە نوو هاتن کەڤن خەلاتن

85.هەر هەکە،هەر لەکە

86.هەکە بووک یە جوان بێ زێر و جلک نە د فەرن

87.هەچیێ رۆژێ دایێ جاکێ سیهـ ژی وێ دیێ

88.هەکە ژن بوو ژن باب مێر وێ بێ زر باب

89.هەچیێ ژ خوەدێ ئی غافل ئی کافر

90.هەکە کەچ نەخری یە داک هۆریە(زاروێ بەری نەخری یە)

91.هەکە ئنیەتا تە درستە بدە بەحرێ،بستەهـ مەرکەب نابە سستە

92.هەکە قەنج با وێ ل دەرێ بابۆ با

93.هەەک چوویە سەر بەحرێ،بەحر د چکیێ

94.هەکە پیرە نمێژ کەرە رۆژێن ئینیا د زەهڤن

95.هەکە تی ب مالی تی ب مام و خالی

96.هەرە با وی تە بگرینێ نە تە بکەنینێ

97.هەفت سالا چوو سەفەرێ ڤەگەریا کەرێ بەرێ

98.هەکە تاس چنگیا چ راست،چ درەو

99.هەکە شیرێ قەتلێ ل دەستێ تەبێ بلا خۆفا خودێ ل ملێ تەبێ

100.هەتا سبە سەد کوم بێ خوەدان د مین

101.هەکە تە کورتانێ کەرێ کرە زێر ژئ هەر کەرە

102.هەکە بەشەر پیر بوو دوو جارا دبە زارۆک

103.هەفت جارا مالا خوە بنێرە دورا پرسێ ژ جینارا بکە

104.هەکە دل غەیری خوەدان ما حەیری

105.هەڤالێ خوارنێ د زەحفن

106.هەکە پسیک نە ل مالە مشک عەبدلرەحمانە

107.هەکە تی دەلەکی چما ت سەرێ جرێکا کار ناکی(شیرەتا لی ناکی)

108.هەکە مێرک پشتە خەسوو چ تشتە

109.هەکە هەڤالێ تە بوو شەکر هەموێ نەخوە

110.حەنەک دبنە جەنگەنە(جەنگ)

**111.هەتا تو کتێ نەدی تو رەجعێ ناخوی**

112.هەتا جەری نوویە ئاڤە جەمدی یە

113.هەتا نەبە قال نابە مال

114.هەتا مرنێ چاڤ ل کرنێ

115.هەتا کەفا دەست رەش نەبێ تاما دەڤ خوەش نابێ

116.هەتا سیلا بەلەنگازا سۆر دبێ نانێ وان خەلاس دبێ

117.هەتا راستیب گەریا درەوێ جێ خوە گرت

118.هەتا خەرا نەبێ ئاڤا نابێ

119.هنگی سەری دمینێ قون عەجێبێ گران دبینێ

120.هنگی تی پیسی تێک ڤەده بیتر بیهن ژی تێ

121.حکومەت کێڤریشکا ب عەرەبانا دگرێ

122.هەتا ئاڤ زەلال نەبێ ماسی خوەیا نابێ

123.هەتا مرۆڤ نەچە نێڤ گۆرا مرن ل بیرێ نایێ

124.هنەک دکن و هنەک دخون

125.هەتا بووک کار بوو دەهوەت بەتال بوو

126.هریا ل تێرا زەر دەیە

127.هەچییێ بەریا خوە ژ بیر کر تالیا خوە نایینێ

128.هەچییێ زمان گەریا شوغل قەدیا

129.هەکە ژنێ بڤێ وێ مێرێ خوە کە رەزیل و هەکە بڤێ وێ کە وەزیر

130.هەکە مێشا هنگڤ خەرا بوو چەنگێن هەڤ دۆ دخون

131.هەکە قانتر زا دنیا وێ خەرا بێ

132.هەکە ئختیار رابوو دنیا خرابوو

133.هەتا دەرێ هیز ب سەرڤەیە یە قەنجە

# و

1.وارێ مه بویه وارێ کوندا

2.وار ژ وار بخێر تره

3.وار ژ خەریبا ئاڤا نابێ

4.ویجاخ نابنه ئاخ

5.وەکی مێشەک ژ قورمێ گوهـ فریو

6.وەکه مریەکی لنگ ژ دەرڤەیه

7.وەکه دیوارێ سەر بەرفێ یه

8.وی دبس خوار و مێشا ب بێن دۆرێ ڤەنیا

9.وەکی پاریەکی قەوالان داینێ

10.وەختێ بەرف سەرێ چا دگرێ جلکێن بەلەنگازا درن

11.وەکی جنەکی بن ئەردێ یه

12.وەکه بەزێ سپارتیه پسیکێ

13.وەکه دزێ رۆژ لی دەرکەتی(لی بویه سبەهـ)

14.وەکی ته نان ب گوها خواریه

15.وەکی پسیکەکا هەفت روحه

16.وەکه ئاگرەکی سوهره

17.وەکە بزنا کەهر ل زک دە مری لی هاتیە

18.وەکە میکوتێ دەستارە هەر جار ل دەستەکی دەیە

19.وەکە ئاڤا سڤۆکێ یە

20.وەکی ت هاتبویە ئاگرەکی

21.وەکە کۆرێ کێچ کەتیە مستێ(کێچ،وەکە سپیها نە )

22.وەکە نان و دەوێ سپارتیە یەک

23.وەکی دارکێ دوهلێ یە

24.وەکە خنجەرا ژ پشێ کێشای

25.وەڤات ژ وەڤات حەیب ناکە

26.وەلی ژ پەلیانە و پەلی ژ وەلیانە

27.وەکە پەزەکی بێ شڤانە

28.وەکە جهوێ ل خەسوا خوە نیای

29.وەکە سەرمەهێت گابارایە( دەرەنگ واتە)

30.وەختەک وێ ئێ سەد موتەمەر تەمرەکێ تژی ناکە

31.وەختەک وێ ئێ کەس ب زمانێ کەسی نزانێ

32.وەکی ب هێکە(یی لەقە)

33.وەکە مویەکی ل ماست هلکێشای

34.وەختێ میهڤان هات وەزیرە هەکە رونشت رەزیلە

## یـ

1.یا دینا ببنه دەریێ دۆژەهێ بوهشت ل بیرێ نایێ

2.یا دێڤ تژی کە یان سەری ژیکە

3.یا دەستێ چەپێ ژیێ راستێ رە نامینێ

4.یا زێر زانێ یان زۆر زانێ

5.یان نەچە بەر پێز یان وێ شڤان کوژێ

6.یا خوەدێ نە ژ قەنج نە ژ خەراب مە بسەر زمانا هلنەینی

7.یان ب نوقوتێ نا شەحتێ

8.یەک وەکە بریندار ب برینا خوە نزانێ

9.یەکی ب سەدی یە و سەد نە ب یەکی یە

10.یەکی نەگۆت مەندۆ کەرێ تە ب چەندۆ

11.یا فێرا فێر نەکە یان چ جارا ژبیر نەکە

12.یەکی دنیا ب خوەرە نەبریە(یەکی تشتەک ب خوەرە نەبریە گۆرێ)

13.یەکی دڤی دەنگەکی خوە چێکە چو ب سەرێ کانیێ دە ریت

14. یەک ژ رۆژا خوە دەرباس نابێ

15.یەکە خوەدێ هەزاری عەڤدا بەتال دکە

16.یەک نابیژێ دەوێ منی ترشە

17.یا خوەدێ تو 72 ملەتا بسترینی و مەژی تەڤدا(دوعا)

# Z

1- Zarok xew kêvirîşkî ne
2- Zarok bi heft renga di guherin hita mezin dibin
3- Zarok zinarin
4- Zarok sebra malayne
5- Zarok di weke cerokay ne ma rîvî li dû bikine xuşe xuş nizanin
6- Zikê têr hajî yê birçî nîne
7- Zimenê te bela serê te ye
8- Ziman di kehnîne yeke tale yeke şîrîne
9- Zimanê girtî qelema zêrîne
10- Zikê birçî têr dibê belê çavê birçî têr nabê
11-Zik zikake ti çi bikyê deng nake
12-Zilamê bê dûnda weke dara bê bere
13- Zarok weke kaxeteke spîne
14- Zavayê li ba xes û xezûra weke kûçikê li ber tenûra
15- Zêr jî yî hûre
16-Zêra bavêje zikaka her kiroş wê ên li maka

# Y

1-Ya dîna bibne deryê dûjehê buhişt li bîrê nayê

2- Ya dêv tijîke yan serî jî ke

3- Ya destê çepê ji yê rastê re namînê

4- Ya zêr zanê yan zor zanê

5- Yan naçe ber pêz yan wê şivan kujê

6-Ya xwedê ne ji qenc ne ji xerab me biser zimana hilneynî

7-Yan bi nuqutê na şehitê

8- Yek weke birîndar bi birîna xwe nizanê

9- Yekî bi sedye û sed neb yek ye

10-Yekî ne got mendo kerê te bi çendo

11- Ya fêra fêr neke Yan çicara ji bîr neke

12-Yekî dinya bi xwere ne birye (Yekî tiştek bi xwere nebiriye gorê)

13- Yekî divî dengekî xwe çêke çû bi serê kehnyê de rît

14- Yek ji roja xwe derbas nabê

15- Yeke xwedê hezarî evda betal dike

16- Yek na bîjê dewê minî tirşe

17- Ya xwedê ti 72 mileta bisitirînî û mejî teva "diwa.

52- Xwedê talya te ji pîşya te çêtir bike

53- Xeber heke derket ji zar wê kevye bazar

54- Xwedê bi dilê sax re ye

55- Xwene berwa qûna biznê ye

56- Xêr il şer nîne

57- Xwezî ez bûka xerîba bam da min pesnê xwe bida

58- Xew û kew nagihin hev

59 - xerîb benkên bê kirêkin

35- Xwîn nabye av

36- Xwîn bi xwînê nayte şûştin

37- Xewin xeyalin hinek dest û derhalin hinek beidî  hezar salin

38- Xidilyas lingek li kanûnê ye yekî li sibatê

39- Xwîna mêra lêke bi deyne

40- Xidilyas qeda û qût xelas

41- Xîret ji îmanê ye

42- Xêr li ser heft desta re di geryê

43- Xezal di bezê û na bezê ji xêrê risqê xwe naxwe

44- Xwe Dike nêva mirov û Keras de

45- Xeta xwehir ji bin gayê pîre

46- Xemka xema ye

47- Xwedê dike mû û na bizdînê

48- Xwedanê salfê bi kêfa xwe yê ye

49- Xêncî cilka xwe ji avê dertînim

50- Xwedê dide hina û ji hina di be

51- Xemla darê pelin

17- Xwezî aqilê kurmanca yê talî li serê min de ba

18- Xelfa li sibatê weke kewê ribatê

19- Xeswê siwarkin ava mezin pî derbas kin

20- Xwedê dayê xwe neke tevayê

21- Xweş mîhvane lê ne xweş mezûvane

22- Xwe nede ber dîwarê xwehir

23- Xewa sibatê weke tirên pîre Fatê

24- Xwedê gotye : min ji tifaqê şerme

25- Xwe dike nêva sol û bizmar de

26-  Xanyê pîrê sitara pîrê ye

27- Xwene derew bi kaviray ne

28- Xwedê hevalê rastiyê ye

29- Xwedanê sebrê be mîrê Misrê be

30-Xwedê da dayne û derman dayne

31- Xêr bi lez

32- Xew derbe

33- Xwedê gûyiza dide bê dinana

34- Xidilyas sal xelas

# X

1-Xala xwarzî rakirin mama birazî êxistin

2- Xal xelke mam milke

3- Xwaryû genyû dayû kenyû

4- Xwarin bi germî şuxil bi nermî

5-  Xwarin ya her kesye mêranî na her kesye

6- Xanyê pîrê xweştire ji koçka mîrî Cizîrê

7- Xwarne bê namûse

8- Xwarzê weledên xalay ne

9- Xêrekê bike û ber avê de berde

10- Xêr hemû ne nan û avin

11- Xwedê deriyekî na girê yan yekî veke.

12- Xwedanên mirya di korin

13- Xwedê delîlê bê delîla ye

14- Xwedê me ji nebû û nedya bisitirînê

15- Xewa mirya tê ya birçiya nayê

16- Xezala tî ber bi avê xare

34- Weke mûyekî ji mast hilkêşayî

Wextê mihvan hat wezîre heke rûnişt rezîle 35-

16- Weke agirekî suhire

17- Weke bizna kehir li zik de mirî lî hatiye

18- Weke mîkutê destare her car li destekî de ye

19- Wekî ava sivokê ye

20- Wekî ti hat bû ye agirekî

21- Weke korê kêç ketye mistê (kêç wek spîha ne)

22- Weke nan û dewê spartîye yek

23- Wekî darkê duhlê ye

24- Weke xincera ji pişê kêşayî

25- Weqat ji weqat heyib nake

26- Welî ji pelyane û pelî ji welyane

27- Weke pezekî bê şivane

28- Wekî cihwê li xeswa xwe niyayî

29- Weke sermehêt gabaraye ( dereng wate)

30- Wextek wê ê sed mûtemer temrekê tijî nake

31- Wextek wê ê kes bi zimanê kesî nizanê

32- Wekî bi hêke. (Yî leqe)

33- Weke Teyirê ji ref qetyayî

# W

1-Warê me bûye warê kunda

2- War ji war bi xêr tire

3- War ji xerîba ava nabê

4- Wicax nabne ax

5- Wekî mêşek ji qurmê guh firye

6- Weke miryekî ling ji derve ye

7- Weke dîwarê ser berfê ye

8- Wî dibis xwar û Mêşa bi yên dorê venya

9- Wekî paryekî qewalan daynê

10- Wextê berf serê ça di girê cilkên belengaza dirin

11-Wekî cinekî bin erdê ye

12- Weke bezê spartya pisîkê

13- Weke dizê roj lî derketî (lî bûye sibeh)

14- Wekî te nan bi guha xwarye

15- Wekî Pisîkeke heft ruhe

# V

1-Vî hevirî gelek av hilgirt

2- Veye dar veye mişar

3- Vî navî vê gavê

4- Van dara van hinara ne me dere ne cînare

15- Tenûr bi tir û fisa germ nabê

16- Tîşkên mara jî her marin

17-Tê sotin nayê gotin

18- Tebaxê agir çû axê

19- Ter û hişk pêk ne şewitîne " Yan pêk şewitî"

20- Tengyên Xwedê mijên gelya ne

21-Tirs mergê rîvye ( merg=ruhê, emire )

22-Teyrek li ser serê xorta ye heke zewicî nû xwe berde serî

# T

1-Talya derewê a kurte

2- Talya temayê gû xwarne

3- Talî û aqûbet

4- Tal û şîrîn ji derekê tên

5- Tavek ket, li pijya ket li dêlê neket

6- Taştê weke dewlemnda bixwe û şîvê wek belengaza

7-Taveke nîsanê hêjaye beranê Brahîm Xelîl û malê xurstan

8- Tiştê ne ji minre weke bayê li ser minre

9- Tiştê çû nede dû

10- Tiliyên destê te hemû ned weke yekin

11- Teyir bi refê xwere î qence

12- Tûrkê vala bi kolê xwede neke

13- Tiştê te nedît bi çavê xwe nebîj bi devê xwe

14- Tûrkê diza bi qule

16- Şert şove ne tove

17- Şêr di mirê çerm di mînê mêr di mirê nav dimînê

18- Şeko beko navê xwe li hevalê xweko

19- Şer kêşû qeda li pêşû

20- Şêr şere çi mê û çi nêre

21- Şîva di kebanya yan şore yan kêm xwê ye

22- Şiv bi terî di biye guhpal

23- Şîr kevalê xwe na dirînê

24- Şivanê pîs ji gur xerab tire

25- Şira Şira avê ez birim belê ji tîhna mirim

26- Şîreta bûkê û xeswê ye

27- Şîrê heqyê li nêv çavê birayê axretê bide

28- Şêx il rê û mirîd il pê

29- Şêx û pîr gulyên darekê ne

30- Şêwir bi xêr in

# Ş

1.-Şam bi nasîn

2- Şahîna hespê ji hinara wê tê

3- Şuxil bike ji asas da dilê te neke wase was

4- Şuxilê îro nehêle sibe

5- Şuxlê bi xelkê weke ava bi selkê

6- Şuxlên bê delîl neke da derdê bê derman te nekevê

7- Şuxil şêre heke te dest avîtê di be rîvî

8- Şuxlên kicik mezin neke

9- Şûjin bi fen tê qul kirin

10- Şûştin reng û rû xwarin gend û gû

11- Şuxil karê xwe be şêrînê ber dilê xelkê be

12-Şûjina li çavê xelkê de dibînê derzya çavê xwede nabînê

13- Şerê sibehê ji xêrên îvarê çêtire

14- Şerê çûka li ser garisê me ye

15- Şova kanûne weke dewleta qanûnê

31- Sê bê aqil hene li dinê, mêrê li ber hukmê jinê, ewê diçe rêka bi tinê, ewê ji halıya bikêsê tûtinê "kurb"

32- Serê wî li cuharê hevala de ye

33- Seryê bê aqil weke gûza bê kakil

34- Serî ne îşê kundirek jî çêtire

35- sed pez xwe dide ber sîha darekê

36- Silav silava xwedê ye

15- Seryên birîn nayne kirîn

16- Sênîka şikestî çêtire ji ya xwestî

17- Serê şerî xweşe û binî reşe

18- Sibatê berf û ba tê

19- Serguh nadin ser bana

20- Simûqî cixara li bin avê de vedixwin " bihfirehin"

21- Sibatê pisîkê kire wate watê

22- Sed alem û inkarek

23-Stûna qenc bide ber xaniyê xwe

24- Sed gotin qurbane kiryarekê bin

25-Ser tilî bi wirde pişt pehnê bi virde

26- Serê çend şaxa dibe newalek

27- Sibat geh di giryê geh di kenê

28- Sê tişt hene neimet, pez, rez, û hûrmet

29- Sê tişt hene dil êş, mitirb, mirîşk, û meş

30- Sê tişt hene bê behwer, mar, av, û agir

# S

1-Sal bi sal xweske bi par

2- Savarên eylûnê jê tê tama hêke rûnê

3- Saleke û careke

4- Saqe û gûre laqe ( di mirovên wek yek bigehin yek)

5- Sebrêt xwedê xêr jî çê dibin

6- Serê ne îşê ne hewceyî  girêdanê ye

7- Siwarê xelkê her î peyaye

8- Siûda mêr bi jinê re ye

9- Serê keçel li bin kum de î qence

10- Sîtilê got binê min zêre hesko got nuhe jî hatîm

11- Ser qûçe û bin pûçe

12- Ser hilwa mal bi gû

13- Swarekî bi tinê tozê ranake

14- Siwara bigrin peya her yên weyne

15- Rez şewitî sivok li dewsê de hat

16- Riya bibire û risqa ne bire

17- Rîh dibe bost û dijmin nabe dost

18-  Rûnê ji axê ye

19- Risqê serê sibê ye ( risqî il xwed ye)

20- Reya ji bin ve qut dike

21- Rojek wê ê av namînê li serê kehnya

22- Rojek wê bê dinya wê li hev kevê, Sunetxan "Êzîdîxan" wê li xwe bi şik kevê

23- Rojek wê ê muhrkên qul bi hetara re namînin

24- Rojek wê ê dinya wê biye yek meseb, olî

25- Roj di bîjê xwezî Carekê min heyva 14 şevî pêşberî xwe bidîta

26- Ruhê wî/ê hat serê kepo

# R

1.-Rastî riya Xwedê ye, derewîn dijminê xwedê ye

2- Rastî li nav agir de na şewitê

3- Rojek wê ê heft jin wê bazdine bitinekî ja wane mêreke

4- Rastye tehle

5- Rasto diristo xwaro pişt şkesto

6- Rîvî ned çû qulê heçkek bi dûyê xwe ve dikir

7- Rîvyekî gerok çêtire ji şêrekî şidandî

8- Rojek wê ê heyîb namînê rûyê bûka û xew çavê piçûka

9- Roja çû venageryê

10- Reş ke û dilê xwedan xweş ke

11- Rehmel gora winda

12- Roja xweş ji sibê de ya xweşe

13- Rim li tora de nayên veşartin

14- Rûniştin ne dake ne babe nabîj ye te rabe

# Q

1-Qesas li qiyametê naçe

2- Qûna xwe rayî zarwa bike ne devê xwe

3-  Qehirî binive û poşman ne nive

4- Qelî ji serê çûka çênabê

5- Qewlê mêra sê carin

6- Qarî marî hemû bûne bajarî

7- Qurix hilat gurya germê çû

8- Qencî ji qenciyê çê di bê

9- Qenc kiro bi xwe kiro pîs kiro bi xwe kiro

10- Qîzanî gelek xweşe bûkanî gelek geşe

Gava kete ber qehra mal roje reşe

15- Pehlê xurt perîze kifşe

16- Perîza bi ser şove ve ye

17- Peyiva xweş bide xerîba û paryê xweş bide ê xwe

18- Piranyê xelbê mêranyê bir

19- Pîreka bî weke kerasê sipî

20-Pisîkê çav belekê mîhvana xweşin şevekê

21-Pesnê jina xwe meke yan piştî heft sala...

# P

1-Paryê hadir nede bi yê deyin

2- Pale poşe ( ji guh xwe kirin)

3- pîrekê bavîje xweşyê û ciwanekê bavêje reşyê û lî binêre

4- Paryê mezin gerwê di dirînê

5-Parsek bi parsek nexweş bû xwedanê malê bi herdwan nexweş bû

6- Peza li tal ve ma gurê xwin

7- Peyivê bikire ne bifroşe

8- Pirs bike ji xortekî dinya dîtî û ji kalekî zemana

9-Pîrê gote keça xwe neçe nêv xorta got a tidbîjî qewmye

10- Pîro çû ava dinya çû liber tava

11-Pesin ji mêra re heybe

12- Pîrî û hezar heybî

13- Peyvên îvara di kevne qulên dîwara

14- Pîne daz pêxwas in cûmker di bê Keras in

48- Ne belengazê poz bilind û ne mîhvana mal li gund û ne zilamê li civata bêje jina mine rind

49- Ne mirne ra lî nabê

50- Ne erebê bi hişînyê ketî û ne belengazê bi dewletê

51- Ne jina gerok û ne mêrê pitpitok

52- ne xweska min bi wî bê derbekê daynê zirpekê hilînê

53- Nîsan di bîjê ez bûka salê me

54- Nikarye kerê di çe kurtan

55- Nizanê dîlanê di bîjê erdî xwehre

56- Nîska navêje dewsa kizinê û berxê ber bizinê û malê nebe cem mala babê jinê

57- Ne ker ketye û ne hîz diryaye

58- Nêrgiz ne buhare dara xoxê ne dare

Jina bê mêr ne ti yare

32- Ne ew tase û ne ew himame

33- Nezan weke dara bê pelin

34- Nezanî rehetya canî

35-  Ne bi xêrên xwe ji xwe radî bibe ne bi gunehên xwe bitirse

36- Ne dîtî û dîtî bi xwede rîtî

37- Ne suhra li ber agira ne rinda li ber çira

38- Ne malê bi fena û ne kurê bi kaxet û bena

39- Ne civata jina û ne bêriya bizina

40- Nefsa qûnê û dev yeke

41- Ne ewrê gugurî ne mêrê tir tirî

42- Nêrgizê heya sizê te nehêla buhar bizê

43- Ne xwaryê bi simbîla ve çû yî

44- Ne deng kirî bin zêre

45- Neçe wir yekî te tî nebê

46- Ne esil kil û kildane esil teşî û badane

47- Ne gundê bê rez û ne Konê bê pez û ne zilamê bîjê ez

15- Nanê pîsa yî pehtye

16- Nan qûtê îmanê ye

17- Ne malê pir ne jina ji xwe bi tir

18- Navekî girane û şarekî wêrane

19- Nehk çûn bajar bûn leblebî

20- Ne li rengê titûnê here û nel çûlê mêra

21- Ne mare bi axê bi eyîşê

22- Ne sar lî tê ne germ

23- Nûberê tire dora gire

24- Ne zer bû ne der bû

25- Ne bîje Ereba merhebe

26- Nermka ne livîn tê ecîbên giran bînî

27- Nêva Êzidyan û fila mûyeke

28- Nêva jin û mêr behre

29- Ne her tiştî jenî zêre

30- Nifirê xwe da ber afirê ( afir =afirandin, Nebû)

31- Ne gelek şîrîn be te bixwin û ne tal be te bavêjin

# N

1- Nan pîjê tîrik dirîjê ( tîrik darê rast kirna nanê sîlê ye)

2- Nanê gerim ney tisye

3- Na xweye na hevala bûye kebanya du mala

4- Nanê sîlê ye ne bere ne pişte ( nîske ne bere û ne pişte)

5- Nanê wî li ser çûkê ye

6- Nanê derya ketiye zik de

7- Nifir şîrê du deve xwedê zanê li kê di keve

8- Nanê pehtî weke siltanê ser textî

9- Nan bi riwê xwe tê xwarin

10- Ne qub hemo ziyaretin û ne rîh hemo sûretin

11- Nanê mêra lêk bi deyne

12- Nanê xwe bixwe bi avê nimeta xelkê bavê

13- Nanê xwe bide nan pîja bila nanek te zîde çe

14- Nanê te wekî li ser sîlê reş bû ye

45- Mêr bi mû û jin hilû

46- Meyira ruhin ji kêm dehnye (girara ruhin ji kêm dehnye)

47- Mêr malê tînê jin wertînê

48- Mehbûb ewe dil bi hebînê

49- Mendê Xelîle bê pa bû ji Herdû îda

50- Mêra ji dîtinê behwer

51- Meşka li rê de heçyê hat û henekek lêda

52- Mar ma Mar bixwe nabe Zîha "Mezin û dijwar

53- Me bûk anî bi lez û bez sifka malê dîsa ez

54- mirovê bê war weke teyrê bê çenge

55- Mû li zimanê min de hatin " serhişke"

29- Mîhvan rizqê xwe bi xwere tînin

30- Mîhvan mîhvanê xwedê ye

31- Min ti il ezmana di xwestî til erda bi dest min ketî

32-Mirov bi zimanê xwe û heywan bi lingê xwe tê girêdan

33- Mirovê bê Îman weke gemya bê xwedan

34- Mirî venagerê bi girî

35- Mirov çiqas pîr dibê pitir dinya pî xweş dibê

36- mirîşkê çav li betê kir qûn derket "werdek=bet

37- Mirin ji perîkên çava nîzîk tire

38- Mêş xwe li dewê tîr digrê

39- Min pîs avît qenc ket

40- Mirovê birçî weke gura ye

41- Min bîrya tilya xwe nekiriye

42- mûya ji mara di qusînê

43- Mirin a tehle

44- Mirin a sare

15- Mala bû jin xera bû ji bin

16- Mala mêrik mala heqe mala babê teqe reqr

17- Mala nû male dest avîte kovelên mara ja wane

qetik û werîsin wê pî çine dara

18- Mala mêr tîde kehnya zêr tîde

19- Mala baba ziyaretin ava cerên wan şerbete

dak heke dimirin zerî heke tên li ba bira bê qîmete

20- Malê selefê ba dibe û baran di şo

21- Malê bi nîvî jî neke hêvî

22- Mala ba li binre derbas bibe ne male

23- Mal il milo ye

24- Malê zehiv bela serê xwedane

25- Mêr kîla xwê dixwe

26- Mîhvanya quling û rîvî ye

27- Ma du serî di weke yek naçine ser cemkekî" balgekî"

28- Mîhvan bi xêr in

# M

1-Mar ya xwe rast bike naçe qula xwe

2- Mare ne cihe ne ware

3- Mar ji pongê di qehirê li derê qulê de hat

4- Mar gestî ji werîsa jî tirsê

5-Marê ji wî warê beidî hezar salî her wê vegere qula wî dîwarî

6- Masî li serî de genî dibê

7- Masî li gola de mezin nabin

8- Masyê dev girtî nakevye tora nêçîra

9- Malê dinê qirêja desta ye

10-Mala bê semyan weke derdê bê derman "serwer"

11- Mala heke meznek tîde nebê kevrekî mezin deynê

12- Malê axa diçe serê xulam di îşê

13- Malê mirya yê zindya ye

14- Malê dinê yan ê heyfa ye yan kêfa ye

14- Li kaxeteke peritî di geryê

15- Li nîr dide û li bizmîr dide

16- Li ezmana xwedê ye û il erda hikûmete

17- Li ba cihwa bixwe û il ba fila binive

18- Li desta li bazında li gula li sosina

Şev şevên dehlêne jin jinên xelkê ne

19- Li dinê û axretê yî rû reşe

# L

1- Lêv li pîş dinanay ne

2- Lingê xwe weke cilka xwe bavîje

3- Lî nêrîna çava qinyata dila ye

4- Li payîza hewa xweştir bû li dêlîza

5- Lîhatin ji jîhatinê çêtire

6- Li nêva Xidir Elyas û Xidi nebî ji nêva mal û mal xafil nebî yan kifnê te li biçenga tebê

7- Li payîza vekin derê hîza

8- Langa hajî denga nîne

9- Li ser gelek ava re bazda ye

10- Li ser mala hêl hêl neke ya bi te nexweş

bi hevalê xwe neke

11- Li solê hespa xwe binêre, paşî dirêjya rê bi zanibe

12- Li navbera gotin û kirnê de ça hene

13- Li pî tengyare firehîne

52- Kîna te kîna pelûlê ye

53- kê dinya kerût yê kirî û firût

54- Kiçkê malê kûçkê malê ye

55- Kirka xwedê qul kirî wê risqê wê şînê

35- Keçel kumê kûr divê û kim dirabên hûr divê

36- Keçka bi kezî û kurkê weke mîheke mêşin

37- Ker bi kerînya xwe heke cakê kete korekê

Cara dî berê xwe jî di gêrê

38- Kerem rabû sinaat hat

39- Kes bi lezê nagehye mirazê

40- Kurê kura kakilê nêva kakila

41- Kûçik hestya dixwe hesabê qûna xwe dike

42-kûçik bi qusandinê nabne tajî

43- Kûçik goştê kûçik naxwe

44- Kûçkê meye li ber deryê xelkê di reyê

45- kê xwar û kê il xwede

46- Kulyek li zeviyê de geleke

47- Kumê vî jî dike û li serê vî dike

48- Kurê qenc biraye ji bab re

49- Kur naneke û bab yeke

50- Koça nezana a şepirze ye

51- Kî bûke ew ber bûke

17- Kehrkê yekî mir kûçkê cînarê wî pî qelew bû

18- Kes nabîjê dewê minî tirşe

19- Kes bi xwezya nagehye bax û kezya

20- Keç teşya dakê di rîsî û kur ya bebê

21- Kifrî, çêr, xeber, bayne

22- Ken û girî behra mirî

23- Kêskên çala bûne kebanyên mala

24- Koda vala deng jê tê

25- Kevrê bê siûda li binê guhe

26- ker ji kera di hekimin tir û fisa

27- Keç warê xelkê ne

28- Kebanî ji tilya xwa têre

29- Kerê wan li korê wan ne sekinê

30- Kes nakevye gora kesî de

31- Kew welatê xwe ji bîr nake

32- Keç guyîza na şkest ye

33- Keç serguh, Her roj hinek têye ser

34- Kumê wî ji rastiya yî xwehre

# K

1-kexeta spî nayte xwendin

2- Kaya kevin ne dîre

3- Kanûna kicik perf hat piçik piçik

4- Kar li hefte bext il çefte ( xwehire"

5- Karin nebwekê bikin hesko lî negeryê

6- Karwan di meşyê û kûçik di reyê

7- Kevrê giran li cihê xwede î qence

8- Kevrê kicik û mezin pêk di sekinê

9- Kes nikarê weke destê te pişta te bixwrînê

10- Keçik neyinkin

11- Kê xêr kir mala xwe têr kir

12- Kero nemir hita qîvar tê

13- Kes ji roja xwe derbas nabê

14- Ken ji dilê geş tê

15- Kehrkê dev avîte guhê berxkê û dikire qîrîn

16- ker her kerê berê ye lê kurtan guhertin

21-Jina xerab berde mêrê xerab derde
22-Jin ji serguh û bext ji Xwedê
23-Jin heye û jinkok hene(mêr heyne û mêrkûk heyne
24- Jin di mirê mêr jar dibê mêr di mirê jin har dibê
25- Jina qenc seyde jina xerab qeyde
26- Jinebî bi fenin ber piştê wan tijî kaxet û benin
27- Jin babê kafir babê
28- Jina mêra be na têra be
29- Jîn herdem jine mêr herdem ne mêre
30- Jin benê hebana ye
31- Ji xasa nagehye nasa
32- Ji vir Hita bi ezmana destên ser desta re heyne
33- Jin kezeba reşe
34- Ji nefsa kete hepsa
35- Ji geyayê buharê hemwê ne tolke
36- Ji gêrik û mêrwa bitir na sekinê
37- Ji sîha xwe tirsê
38- Ji sed suhrî çav hişîn yekî qenc

# J

1- Ja bergîrê ye heke birçî bû têr nabe û heke têr xwar hewa birçî nabe

2- Ja diza ye dinya hemû a dize

3- Ji dilopê di biye gol

4- Ji ava hêdî bitirse ne ji a hêl

5- Ji ber şirkê çû ber mizrîpê

6- Ji hineka re adete û ji hinara qephete

7- Jehir ji mara xelas nabê

8- Ji sed tokilî yeke xerabe

9- Jîrî ji şîrî hitab pîrî

10- Ji xelkê re luqmane ji xwere bê dermane

11- Jijo di bîjê : tîşkê min çî nerme

12- Ji wî bitirse ê ji Xwedê ne tirsê

13- Ji dîna re herû dehwete

14-Ji şîr kir il ser kîr kir

15- Jî keto pî keto

16- Ji mino li mino

17- Ji şîretên dîna û pîsa xafil nebe

18- Ji te hereket ji min bereket

19- Ji dinê re nan ji axretê re Îman

20- Jina baş stûna mala ye

# Î

1-Î xêr kerbe ney xêr xwer be
2- Îro heye sibe nîne
3- Î deng bilindî gav hûre
4-Îro mîhvane sibe bi lîdane disibe ji wane
5-Î xew kêvirîşk ye
6- Î ziman xweşî zik reşe
7- Îşa vê tiliyê ne jî vê tiliyê re ye

# I

1- İnsan teyrê bê çenge ( beşer teyrê bê pere )
2- ilim behre
3- insanê xerîb yî kore

116- Hita sîla belengaza suhir dibê nanê wan xelas bê
117- Hita rastî geriya derewê cê xwe girt
118- Hita xera nebê ava nabê
119- Hingî serî di mînê qûn ecîbêt giran di bînê
120-Hingî tê pîsî têk veda bitir bîhin jî tê
121-Hikûmet kêvrîşka bi erebana di girî
122- Hita av zelal nebê masî xweya nabê
123- Hita mirov neçe nêv gora mirin li bîrê nayê
124- Hinek di kin û hinek di xwin
125- Heta bûk karbû dehwet betal bû
126- Hirya li têra zer de ye
127-Heçyê berya xwe ji bîr kir talya xwe naynê
Heçiyê ziman gerya şuxil qediya 128-
129-Heke jinê bivê wê mêrê xwe ke rezîl û heke bivê wê ke wezîr
130-Heke mêşa hingiv xerabû çêngên hev do dixwin
Heke qantir za dinya wê xera bê 131-
132-Heke ixtiyar rabû dinya xera bû
133-Heta derê hîz bi serveye yî qence

96- Here ba wî te bigrînê ne te bi kenînê
97- Heft sala çû seferê vegerya kerê berê
98- Heke tas çingiya çi rast çi derew
99- Heke şîrê qetilê li destê te bê
bila xofa xxwedê li dilê te bê
100- Hita sibe sed kum bê xwedan di mîn
101- Heke te kurtanê kerê kire zêr jî her kere
102- Heke Beşer pîrbû du cara dibe zarok
103- Heft cara mala xwe binêre dora pirsê ji cînara bike
104- Heke dil xeyirî xwedan ma heyirî
105-Hevalê xwarinê di zehvin
106-Heke Pisîk ne li male mişk Evdil rehmane
107- Heke tî delekî  çima ti serê cirêka
Kar nakî. " şîreta lî nakî"
108- Heke mêrik pişte xesû çi tişte
109- Heke hevalê te bû şekir hemwê nexwe
110-Henek di bine cengene ( ceng =şer)
111- Hita ti kitê nedî ti riciê naxwî
112- Hita cerî nû ye ave cemidye
113- Hita nebe qal nabe mal
114- Hita mirnê çav li kirnê
115- Hita kefa dest reş ne bê tama dev xweş nabê

77- Heke avê jî ti birî li ser bîra pîsa re derbas nebe
78- Heke got hoş hoşe heke got çû çû ye
79- Heke livî lêve ez zanim çi li dêve
80- Heke qulpkên biharê kifş kirye wê kifş bê
81- Heft mala Keras şoyek têr ne dikir
82- Heke deşte û heke zozane ruhê pez şivane
83- Heke tî bi şovî tî bi tovî
84- Heke nû hatin kevin xelat in
85- Her heke her leke
86- Heke bûke ciwan bê zêr û cilik ned ferin
87- Heçyê rojê dayê cakê sîh jî wê dê
88- Heke jin bû jin bab mêr wê bê zir bab
89- Heçyê ji Xwedê yî xafil yî kafir
90- Heke keç nexrye dak horye " zarwê berî nexrye"
91- Heke eyneta ta diriste bide behrê bisteh merkeb nabe siste
92- Heke qenc ba wê li derê babû ba
93- Heke çiwe ser behrê behrê çikyê
94- Heke pîre nimêj kere rojên înya di zehvin
95- Heke tî bi malî tî bi mam û xalî
heke tî rûtî ti melke mûtî

58- Heçyê pir kir kezya xwe kur kir
59- Hita Dîkê sibehê bang dike dinya bi xêr e
60- Hevalên mirya kevir û darin
61- Heke nezan bûne rêzan meded  ji destê wan
62- Hijdayî kanûnê rojê berê xwe da havînê
63- Hijdayî adarê rojê berê xwe da buharê
64- Heke destê tey dirêj be bila zimanê tey kurt be
65- Heke li pîş bûkê nehat li paş bûkê nayê
66- Hêk bi xwê û xwê bi tam
67- Heke dêlke li seye sey ji Bexdayê ye
68- Her gulekê bîhnek jî tê
69- Heke te barekî gûyîza lî kir xiştîn jî nayê
70- Heke te bivê jina te wê biye dar qûn
û heke te bivê wê biye xatûn
71- Her berx wê çe ber mehka xwe
72- Heke ji devê guh gehiştê qence
73- Her mal barkirnek mal xerakirneke
73-Heke xwîşk çavê çepê ye bîra ê raste
74- Hespê ji dewlemenda bixwaze û jinê ji belengaza
75-heke li hîvyê bim her ezê ev bim
76- Heke ti bû beg û paşa li miletê xwe neke haşa. inkar

41- Heke çû ê xelkê ye û heke vegeriya ê mine
42- Hebîbî necar serê xwe deyne weke her car xwedê
yeke û ferecî hezar xwedê mêstire ji şah û xuntkar
43- Heke çû bi qeydik û mirbeta na sekinê heke hat bi dezyekî xav tê
44-Hêsin bi sarî di kutê
45- Her salek hemreke
46- Hetanî nanê mirov li tûrkê xelkê de bê mirov têr naxwe
47- Her kezîzerkê simbîl soerkî li bere
48- Heke mêrî çav li dere jine xwelî sere
49- Heke mısır xerabû ereb hemo nikarin ava bikin û heke dewletên ereba hemo xera bûn Misir karê ava bike
50- Heke dikandar miflis bû defterêt Kevin dertînê
51- Heder her û her
52- Hêstirên çava lêk bi deynin
53- Heke şêx bû av nede nav
54- Herdû dizên qulekê ne
55- Heder li ber miqeder nabê
56- Hesp nîne alif çêdike
57- Heçyê gelek da ber dasê wê mînê asê

22- Heke xwedê da yekî nabîjê kurê kê yî
23- Heke bi dengê bilind ba wê ker muxtarê gund ba
24- Heke ecela biznê hat nanê şivîn dixwe
25- Heke xwedê a mêrwê tînê pera pî tînê
26- Heçyê çiwe masya qûnê şil bê
27- Heke nej fisada ba mîh û gur wê bi hevre çeryan
28- Heke te girt bernede heke te berda bi dû nekeve
29- Heke didwa kire tebayî karin çiya hildin ser çiyayî
30- Heke kurmê darê nej darê ba dar xera ned bû
31- Heke min hezar werîs çêkir wê hezar heçkî pîveke
32- heke peyive li rûye gunhî efoye
33- Here ser hêwyê neçe ser sêwyê
34- Heke dirav kete kurtanê kera di zirîn
35- Heke kurmanc yî têre xew jîre xêre
36- Her roj mirî wêrîsekî dûrî mal dikevê
37- Heke mala babê gavane zeye jî recû girane
38- Heke me pez nedye me bişkol dîne
39- Heyiva reş roj nema geya nema poş
40- Heke siwar siwar bû hızın  betal bû

# H

1-Hafa bê esla ye.  ( haf= roja wane)

2- Hajî bayê felekê nîne

3- Ha dar bir ha ser bir

4- Havînê jî rojên sar heyne

5- Hukmî hekîme

6- Heke Şam şekire welat hîj şîrîntir

7- Her jinek wareke

8- Heke ti xêrekê bigehînî nebî ji kî dinê

9- Hespek û qespek li bal yekin

10- Heke şirîkanye qencba nuhe xwedê bi şirîk bû

11- Hevalekî lingê çerixî nîne

12- Heçê teibî wê leibê

13- Heke a xwedê hat a evda a betale

14- Heke hêwî mêşe hîj dilê min ji  ber têşe

15- Heke a kiçik sergîne hîj li ber dilê mêrke şîrîne

16- Hezar dost ne geleke dijminek geleke

17- Her gundekî maleke xwe tî avake

18- Heke ga ket kêr di zehvin

19- Heke dizî ji male ber girtine betale

20- Heçê ne ji malekê nizanê bi hewlekê

21- Heke av li gola de ma bîhin jî tê

38- Go tîtî lingên xwe berû ezman dike dibîjê heke
Ezman ket da li ser lingên min bi sekinê
39- Gotina dirêj mirov dike gêj
40- Ga diçe çerim di mînê mirov diçe nav di mînê
41-gor heye seran ser gor heye beran ber gor heye xwelî ser

18- Go yek çû gundekî hemû bi çavekî bûn wî jî rabû çavekî xwe deranî
19- Go heke Siûd çû ji bale heke peyîft mitqal bi mitqale wê bîjin peyva vî ça tale û heke Siûd hate serî heke zirya wekî kerî wê bîjin tevî çiwanî tevî serî
20- gotye rabe û ez bi tere
21- Gulanê dil kul kir ji kul û Kovanê
22- Guhekî bike serad û yekî bike bîjing
23- Gulanê çingîna dasanê
24- Gur eyarê xwe na guherê
25- Gîska gurî venaxe ya ji serê kehnyê
26- Gîsik bi dizî nêrî dixwe û aşkaran di zê
27- Girara bi zuxre
28- Girêka bi dest vebê bi dev neçê tê
29- Girêka xwe bi pişt hêçik êxist vêca hewe
30- Girara mêra bi hemdê di kelê
31-Geyayê hewşa yî tehle
32- Geya li bin kevra de na mirê
33- Geya li ser koka xwe şîn dibê
34- Gêre bi golka nabê
35- Genim bê zîwan nabê
36-Got: ê li serê miletê min kire ferma
ezê li serê wî kime axir zeman
37- Go rojek wê ê xesû bi bûkê wê şêwrê

# G

1. -Gavan ber bi mal bû jina wî şuxil kar bû
2- Gava mitirb birçî dibê dehwet bi bîrê tên
3- Gale gala şivana mal mîratya mezûvane
4- Garis gul bû baran hat û şil bû
5- Gazin ji kur go ji cihê recwê
6- Gotinên berya nexşê ser kevrane ne av dişoye ne roj dihilînê her û her dimînê
7- Go bila hebe bila kurê kerê be
8- Golkekî rîxoke garanekî bi xwere xera dike
9- Gotinên îvara di kevne qulên dîwara
10- Guhê xwe bide ilim ne aalem
11- Got hespê babê min xwe heft rima tavît got ev hespa babê teye û ev meydane
12- Gotine pisîkê goyê te dermane rabû ax da ser
13- Go kê çavê te derêxist got mirovê min
14- Gola pira a xeriqye
15- Gotin tu ji kurî? got: hîj ez ne zewicîme
16- gûzên xwe li ser dilê min dişkênê
17- Go heke ji te neyê ti bi cem xwedan siûda bikevî li warê wan deyne

# F

1-Fenêt mêra kelehin

2- Fesal ji sûndê çêtire

3- fîda gavan siwarbûna kerê ye

4- Fira mirîşkê Hita bi kadînê ye

5- Filê pîr bisilman nabê

6- Fikrê şêx çi be zikra wî jî ewe

21- Ê cihil çûka li bicenge xwe de di birîjin
22- Ê ne ji malekê nizanê bi hewlekê
23- Ê bîjê û bike mêre ê ne bîjê û bike şêrê
ê bîje û neke kerê nêre

# Ê

1- Ê qenc li xwe na heyirê
2- Ê ne li şer şêre
3- Ê ji nîvê rê vegerya ney poşman e
4- Ê bilind firî wê nizim kevê
5- Ê nekir bi ja mezna lî tên qûçên bizna
6- Ê zane zane ê nizane baqa nîska ne
7- Ê şil ji baranê natirsê
8- Ê zanibê hingiv bibirê wê mêş pêvedin
9- Ê bitirsê napirsê
10- Ê mihtac meynûke ( bê rûye )
11- Ê kêrî xwe nehat kêrî kesî nayê
12- Ê deryê xelkê kuta xelk jî wê derê wî kutê
13- Ê jî tê lî tê
14- Ê zavayekî wî hebê kerekî wî heye
15- Ê qedrê dak û baba girt qedrê xwedê girt
16- Ê zewicî ewicî
17- Ê ji te mestir bi rojekê zanetire bi salekê
18- Ê keç da bi jinê axret da bi dinê
19- Ê bi aqil guhdar kir ê bê aqil behwer kir
20- Ê nekir naxwe

17_ Erzanî ya bi xêre
18- Em bûne weke nehka li kevir ketî
19- Ez masya li behrê de na kirim
20- Ez ketime nêva Hesen û defê de
21- Eyîşka li xwe bi şike
22- Ew dîwana ti nexwestî neçê tê
23- Ez di bîjim yî nêre ti di bîjî bidoşe
24- Ez jara jar dikim û bara bar dikim
heke ney radye bi ser de xwar dikim

# E

1-Ew ware lê ne ew buhare

2-Ez nebînim jina bi yar û mêrê bi guhar

3- Ewrekî reşî tarî ne hebek weşya ne hebek barî

4- Ew çi di bîjê û tembûra wî çi di bîjê

5- Ew tehta te pîde mîstî baranê şoşt

6- Ew jina bê mal û mêre a bê xêre

7- Em ned çûne kûrekî nuhe di çine tûrekî

8- Emê bine qûç hûn bibne teyir

9- Ezê yekê bi te kim heke bî bi Konê kevin nekirî

10- Emanet Hita bi qiyamet

11- Em bûne pirska ser zimana

12- Ev bû serê ga

13- Ev lê lê ye hîj lo lo ma ye

14- Erd emanetê xwe naxwe

15- Ez di kelînim wî divê kefê li sere bigrê

16- Ev jî hêsinê wê kêrê ye

67- Dewsa xincere di çe ya peyiva tal naçe
68- Dûr bi nûr
69- Dûr here û dirist were
70- Diwê rîvî şehdê rîvye
71- Duhnê me li serê me da
72- Dira bide dır nasa
73- Dostê baba nabin dijminê kura
74- Diwa li parye hadire
75- Dinya ware ne male
76- Deryê xwe bigre cînarê xwe diz derneyêxe
77- Dûyê kûçik rast nabê
78 Dinya gule her wext rengek
( peyiv gule nabê dîm ber bihna yekî bê
79- Di lomînê na domînê
80- Di bîjê û na pîjê
81- Di sebirê û na buhirê
82-Dûbişk gote mar tu pêvede ezê xwe rayîkimê namirê, ezê pîvedim tu xwe rayîkê wê mirê
83- Dîkê xwe li ser qesrê serjî dike
84- Dinya hemo ji aqilê xwey radiye kes ji malê xwe radî nîne
85- Dijminekî şehreza ne dostekî bê aqil
86- Dara bê pel xelik kevra na vêjê tê
87- Def hate Pol, Pol bi dest neket

43- Destê ti nikaribyê biramîse
44- Destê nel govendê î nerme
45- Destê nêv agir ne wek yê nêv avê ye
46- Destê wî li hemû qula de ye
47- Destekî bi tinê naçe ser xwarnê
48- Destê mino kesê mino
49- Dev dixwe çav şerm dikin
50- Devê xelkê ne tûrkê mirove bide ye
51- Devê wî ji şîr di şewitî pifî dew dikir
52- Devê rîvî ned gehişte tirî di got î tirşe
53- Devê pîvaz nexwarî bîhin jî nayê
54- Dengê duhlê ji dûr yî xweşe
55- Dewleta bi lez pez û rez
56- Dewê ceribandî ji mastê ne ceribandî çêtire
57- Derew li mirya dibin il saxa nabin
58- Delala delal nekin yan wê qehpin yan pîsbin
59- Dema dak di mirê bab dibe mam
60- Derdê kezebê li ser siwarê neqebê
61- Derewke xwe bike û şehdekî xwe rake
62- Deryên xêrê nayine girtin
63- Dewlet serê xwedê ye
64- Demê dirûnê di rûnê
65- Dem bi demê re û hemû bi Xwedê re
66- Derdê sêwya girare

20- Dilê xweş dîm lî buhare
21- Dizî her dizye çi hêkek û çi gamêşek
22- Dilka bar dikir kıza bayîv di çandin
23- Dinya şar û mişare
24- Di jin dîwanekin
25- Dil dostê xwe nas dike
26- Dinya çerx û feleke
27- Dinya dijminê kewê ye û kew dijminê xwe ye
28- Dinya milkê xwedê ye ne milkê kesye
29- Dîm qurmik li ber lê nayên
30- Dinya wê bi ne layîqa mînê
31- Dezyê zirav li navbera ye bi aqil û yê bê aqil de na qetyê
32- Dinya ji hinare berye û ji hinare av û her ye
33- Dinya tara bîjingê ye
34- Doxa dina ye
35- Dirav nanê pehtye
36- Dîlana zana bi nezan di geryê(Aş jî)
37- Di seryên berana li beroşekê de nakelin
38- Dizê bi zengile
39- Destê teibî li ser zikê têre
40- Destekî bi tinê çepka na kutê
41- Destê ser xwarnê yî dirîje
42- Dest vala ne ehle û ne wesehle

# D

1 - Das ji destê pehla nayê girtin
2- Darek nîne ba ne hejandî
3- Dak û dotê şer kir bê aqila behwer kir "dot keçe "
4- Dar bi terî tête tewandin
5- Dar bi ziravî û insan bi stûrî tête şkênandin
6- Dara minêka ber nagirê
7- Dar bi berê xwe û mirov bi nanê xwe
8- Dar çendê ber digrê serê xwe tewînê
9- Dakê qeda yê xwîşkê belayê tehlîşkê jinê were
Kurmilên minê te gerînim li dora dinê
10- Dak motka keçê ye
11- Dan kutê nezanê heba cih nîşanê
12- Daka heft kura li ber dîwara ma
13- Dar a tehle lê pelê darê şîrîne
14- Dîkê qenc li hêkê de yî qence
15- Di kujê û bi cem termê wî di kevê
16- Dinya bi dore ne bi zore
17- Dil di şkê belê pîr nabê
18- Dizyê xwe da ber qehpetyê
19- Dildarya dila li dayina destare a kifşe

# Ç

1 - Çavê li derya xwelî li serya
2- Çavê tirsonek Sîngê spî nabînê
3- Çavê şil ji dilê kule
4- Çavê kul ji çavê kor çêtire
5- Çav kevira şikênin
6- Çav li çava di kevin ça li ça na Kevin
7- Cayê Şingalê cihê qirara ye
8- Çayû bab û birayû
9- 22-çêr diçine ezmana vedigerîne xwedana
10-Çiya çend bilind bê her rojekê rê herê
11- Çi kevir li kaba te ketiye
12-Çi ba çi baran ji hemrê berfê kêm dibe
13 Çi li hûr de çi li tûr de
14- Çirya yû dirya yû
15- Çilê piştî çile malê barke ser gira
16- Çendê mirîşke reşe hêke spye
17- Çendê avê bikutî her ave ( Poş jî)
18- Çemçka hemû girara ye
19- Çend bitire çêtire
20- Çi Hesen keçel û çi keçel Hesen
21-Çûk nikilê xwe li avê de dike û li ser xwere li xwedê di nêrê

# C

1 -Cawê spî reş nabê

2- Cînara berî malê bigre

3- Cînar şifayî cînare

4- Cînarê qenc xweyî û xwedane

5- Ciwamêra got ye : rehnê xwe biqelîşe û genim bikê

6- Cer li riya avê di şikê

7- Cûrên xwedê hemû ne şid û tayne

8- Cinet ne bi nimet

9- Cineta te mala te ye

10- Cihên miriyên te lî nebin ne warê te ye

11- Ciwanya mêr aqilê wî ye

12- Cih ji dila yî tenge

13- Ciwamêra got ye : sitar ji ya mêstir

78- Beterî ji gayê cuht re
namînê
79- Berxê nêr yê kêrê ye
80- Berê bixwe paşî Bi şêkirîne
81- Berû da biznê dev avîte
qimçkê
82- Berxê mijok ji di daka di
mijê
83- Bext nadim bi text
84- Bû tenya sîlê bi minve
85- Betalî xerab malî
86- Beroş li ser sê kucka di
sekinê
87- Beroşa bi tinê heyata li vê
dinê "çidabûne,
88- Beşer ma ji axê têr naxwe
naxwe
89_Berxê du maka ye

60- Bîhdera şirîka agir pî ket
61- Bîhdera kayê hecê hat û melhîbek dayê
62- Bîna keça 40 salî neyne jinebya 20 salî
63- Berî baranê xwe şil neke
64- Belengazî ne milkê kes ye
65- Bû fîtka Hesenê hewêrî
66- Berî baranê ba tê û berî mirinê şid û ta tê
67- Berf dehweta kûçka ye
68- Berû ji qalka xwa dere
69- Berf di hilyê ça di mînê
70- Bertîl kevra nerm dike
71- Behir bi devê kûçkekî na herimê
72- Berî wermê dax bike
73- Beleko bi lepê xw
74- Bextê mêra zêrê zere
75- Benkekî ji qadê hilîne heke ti pê mihtac nebûyî
were min pî bi xenqîne
76- Bilindî ji qulp û şala re
kinikî ji nav mala re
77- Bê pîrekî neçe dîwana mîrekî

45- Bila çavê mirov derkevê ne navê mirov
46- Birînên kevin nû neke
47- Berê mirina beşer li ser kefa dest bû dîm digiriya nuhe li qurim guhê ye
48- Bi pirsê çû xursê
49- Bi nifira tê çî afira " afir =afirandin nebû"
50- Bi tayekî reşkê di kelê " zû di kelê"
51- Birîndar bi birîna xwe zanê
52- Bila dil bi dil bê bila torkê parsê li mil bê û binê tûrik jî bi qul bê
53- Bîra mirov kevir avêtinê xelk jî wê avîjê tê
54- Bîra te av jî vexwar kevra navîjê tê
55- Ber ji  besta xelas nabin
56- Bîr bi derzyê nayê kolan
57- Bîhna dakê ji xaltîkê tê
58- Bîhdera dereng ma nabe xwerê xweyî
59- Bîhder ji xwedana ciwamêr tire

31- Bila nanê te cih bê bila xulkê te genim bê
32- Bizna kol helmye dehnokê şor
33- Bi zimanê xweş ti karî mara ji qula wan derînê
34- Bi kulmê neçe dirêşê " dirêş =wek şûjine)
35- Birçîbûn kafire gunhê wê bi kesî nayê
36- Bila bûka ta gêj bê na zima dirêj bê
37- Bi tilya kul de namîzê
38- Bila bela wî ji ber lingê wî bê
39- Behwerî weke çave heke mûyek kete nave xwedan ji ber yî tengave
40- Bilûra ber guhê gaye
41- Bi gotinên jina meçe komên Zêra
42- Bide pîsên xwe ji axayên xelkê çêtire
43- Bi alastinê zik têr nabê
44- Bi dwayên te nebûyîme hitaî bi nifirên te bimrim

17- Bûk bûne dido xeso dane hev dû
18- Bûka mam Osmane îvare li kezwana sibehê li ser bana
19- Bû fit fita mirîşka dîka xwe da anîşka
20- Buhişt bi tinê na xweşe
21- Bihar ji kîs kerê nêr û mirovê bê xîret di çe
22- Biharê tînye çokê
23- Bira bira ye û bazare cida ye
24- Bi gulekê nabye buhar
25- Bila li rom be ne li gor be
26- Bizin ji şevekê re cihê xwe xweş dike
27- Bila mirovî deyndar bê ney xwîn dar bê
28- Bizin bi pîyên xwe û mîh bi piyên xwe
her kes û emelê xwe
29- Birayê ne ji dê silav kir ji pê ji ber ber miatiba dinê

30- Bizna kulek û şivanê sivik pêkre di gehin mal

## B

1 -Barê ketî li erdê namînê

2- Barê xwehir nagehye mal

3- Bar naçe ber ker ker diçe ber bar

4- Bazdan nîvê mêrantiyê ye

5- Bar min na êşînê ser bar min têşînê

6- Babê keça mêre

7- Berû ji qalkê xwe ya dere

8- Baş oldaş heye û xerab oldaş heye xayîn oldaş heye

9- Bi werîsê xelkê neçe dara

10-Bûka mezin kebanya malê ye

11-Bûke ser hespê ye xwedê zanê risqê kê ye

12- Babê xwe kuşt da bi gorê sond bixwe

13- Bûk bê zimane xesû bê îmane

14- Bi tûfenga xelkê şer nabê

15- Bû beroşa Behlol

16- Bûka salê berde malê

43- Alyekî dinê xêre û yek şere
44- A yê dîn û dista şîre
45- Agir li qurma de ye
46- Agir bi agir venamirê
47- Agir babe nabê rabe
48- Agir bi darikên kicik hilke
49- Agir berda kayê xwe da ber bayê
50- Agirê bin kuçka dîm yî germe
51-Agir bi mala yekî ket yekî di got ka cixara xwe pî vîxim
52- Axa her axaye

21- Av li cihê teng de deng jî tê

22 -Ava serê te li kuç kir

23 - girê kê geş bê ew li bere

24 -Av ji serê kehnyê di xewidê

25- A jinkê û hevîre " mehna lî digrê"

26 -A te ne ji kirkê û binde ye

27 -A hineka gûyîzin di xişxişin a hineka temrin di dewisin

28 -Aqilê sivik barê girane

29 - Av hemo tişta di şiwê rûyê reş netî 30- Aqilê bê aqila nîska ne keloke

31- Aqil nel bejnê ye li ser ye

32- Aqil ne ji kicik û mezint ye

33- Aqilê cihla" xorta" li çava de ye

34- Anî ji derya da bi xêra mirya

35- Aqilê dîna li bin kum de ye û kum li ser ye

36- Aqil tancê zêrîne li serê hemû kesî de nîne

37- Aqil dehyeka xwedê ye (10_1)

38- Aş di geryê aşvan pesnê xwe dide

39- Aş çû ye çeq çeq maye

40- Aşê xwedan siûda bê av di ger yê

41- Ar ji kesê belengaz re bare "şrefe Mebest"

42- Azîma quling û rîv ye

# A

1- Adarê meşke li darê

2- Adarê serê darê xweştire ji binê darê

3- Adar gehişte bîstan xweş dibe bax û bustan

4- Adarê sibehê sare nîvro buhare

5 -Adar di reşînê nîsan di xemilînê

6- Adarê berf gehişte pelê darê namîne danê êvarê

7- A dev ji minre a dil ji tere

8- Ava bîr bi tedbîr "tekbîr"

9 - Av avanye

10- Ava xwestî naçe hestî

11 -Av zanê kîder nîska tînê

12  Av û av çû

13 -Av bi heqya xwedê di sekinê

14 -Ava koteka bero jor diçe

15 -Ava te û wî bi sayîgekê de naçe

16 -Avê vexwe ji kehnyê jinê bîne ji aslê

17 -Av ketye qula wî de

18 -Avê li paya xwa dew dike

19- Av li riwê wî nîne

20 -Ava ser berwê wek zavayê bi dilê xeswê

## 1-çima hezar gotin...?

Ew bixwe hezar gotin bitirin heyne lê,  ev keda salekê bû me ji devê dapîr û bapîra bihîst û veguhastin û li nav galgala rojane hatin gotin, gotina hezar çima? berê heke pezê yekî bûba 1000 serê yek jî berdan weke xêr di gotin me serê hezarî berda,
Û her wisa dibêjin :hezar û yek nav li xweda ye navê mezin her xwedaye.

## 3- Giringiya Gotinên Berya çî ye ?

1-Giringya wan ewe li nav gotinên rojane de tên bi karanîn û bi hêz dikin kurt û cewherîne û hemû rexin û şîret in û bûyer û serbûr in, weke peçeka mirov dike nav heryê dike kerpiç qewî dike gotinê û bi hev ve girêdide bi risteke kurt, her wisa li civat û mehfel an tê bikaranîn li nav galagalê re û gelek cara gava bûyerek rûdide kuştin dilmayîn, dîsa wek dibêjin : "xwîn bi xwînê nayite şoştin" bi van gotina wan bero aştî û lihev hatinê didin, her wisa ne tenê li nav gotina rojane belko li warê felsefe, helbest, çîrok, û salif serhatiya de jî tên bikaranîn û bi hêz dikin.
**Elyas Qîranî 2022**

# Pêşek

## Gotinên berya pêşiyan çîne ... ?

Gotinênpêşiyan,beryan,mezinan,hikme,advice pend,,Gotinên berya beşek ji edebê Folklorye, gotinên gelin yên bi hezarên sala bapîr û dapîrên me li keşkûla xwede parastîn sîng bi sîng dev bi dev nefş bi nefş gehandîne me em jî wê wisa bigehînin yên li pey xwere,ev gotinên berya hatîne bi kar anîn û xwey wan ne diyarin navê wan lewma bûyne yên berya pêşiyan, dagirtî ne ji ramana û serborin, şîretin şehreza û aqilmenda gotîne her yek jî çîrokek Serhatyeke bûyereke li derekê rûdaye û her wisa rexne û şîret in di hûr û kûr in weke em di bîjin kurt û cewherî ne, sembûlîkin " remzî" ne zû nayne fîm kirin lê ramana wane kûre û li felsefa jiyana rojane tên bi kar anîn li nav galagalê re  ev nîvişkê gotinê ye, ev gotin ne milkê kesî ne û li hemû devera bi yek ramanê tên bi karanîn belkî devok cida bê, û divê bi van gotinan neyte leyistin yan jî ji wata xwe derdikevin, ev gotin li sê qonaxa re derbas bûne berê ev peyiv gotin bûn piştre bûn zanist, piştre bûn  pend û şîret.

## Pêşgotin

Herdo nivîser û rewşenbîrên xwîn germ û çeleng Elyas û Heyder zend û baskên xwe ramalayne ji geryana û komkirina Gotinên berya li Şingalê,û şev û rojên xwe kirîne yek heta destekeke pêkhatî ji hezar gulên reng û reng ji baxçê felsefa bab û bapîran biçînin û li guldankeke pir rengîn de bikne diyarî ji bo aşiqên dîrok û folklor û felsefe û zimanê mîletê xwe... Gotinên berya destpêka nasandina nasnama miltane bi civaka mirovatiyê lewma cihê potepêdanka meznin ji aliyê kesanên pispor li warê enterpolojya û bi peyî dewlemendiya wan gotinan bi raman û hizrên afrêner radeya pêşkeftin û şaristaniya her miletekî di tê diyar kirin...devera Şingal jî go bi motka gencîna folklorê kurdî di hête hijmartin heta nuhe gelek alî ji vê samana pir buha lê nehatîne erşîvkirin lewma fere pêngava birayên bi rûmet û qedir bibye henderek ji bo tihnyên hizir û bîrên beryên me li qonaxên dîrokî yên cuda cuda de, dîsa jî dil destê herdo dost û bira di givîşim û serkeftinê ji wan re dixwazim.

Seîd Cirdo
Dihûk, kempa îsyan
2021

# Pênasa nivîskaran

**Elyas Elî Elyas,** tême naskirin bi Elyas Qîranî, Li sala 1991ê li komelgeha Sîbayê ya Başûrê çayê Şingalê ji dayîk bûyme, xwendina xwe hita amadeyî li Sîbayê min qedandiye û piştre Min beşê "pertûkxan û zanistê" temam kirye li zankoya Mûsil li sala 2014an her wisa bi zimanê, Kurdî , kurmancî ,Erebî, Ingilîzî, zanim ez helbestê di nivîsim û karê rojnamevanyê dikim li dezgehê, Yazidi news, de bernamê (Warê bab û kala) pêşkêş dikim) , li gel hiskirin û Şabaş

**Heyder Eerebo alYûsivanî** li sala 1991ê li komelgeha Bûrik li bakûrê çayê Şingal ya bi ser nahya Sinonê ve ji dayîk bûyme, min xwendina xwe hitanî amadeyî qedandiye li komelgeha Bûrik û piştre bekaliryûs adab temam kirye beşê "wêjeyî" li zankoya Mûsil, min beşdarî li rojnama dengê Laliş û Şingal Laliş û mehel de kirye û gelek gotar jî dayne dezgeh û malpera

Pirtûkeke min heye bi navê " Xemla hezar reng" û ev karê min yê didwane, li gel silav û rêz.

## DIYARÎ

**Em vî karî diyarî dapîr û bapîra dikin**
**Heke hetanî roja îro li Keşkûla xwede parastîne**

# Mal avayek
# Mal avayek ji bo her kesê gotinek li bîra mere anî û daye me…

**Navê pertûkê : Hezar gotinên berya**

**Nivîsîn û komkirin : Elyas Qîranî & Heyder  Al Yûsivanî**

**Babet : filiklor**

**Dîzaynê bergê : Dexîl Cano**

**Dîzayîna naverokê:  Eldînê qûlo**

**Pêşgotin : Seîd cerdo**

**Çapa didwan : 2025**

**Çapxana: Cangal**

**Email, tel :eliasqirani91@gmail.com**

Hemû maf di parastîne ji bo nivîskar ©

# HEZAR GOTINÊN BERYA

Yên Êzidiyan

**Elyas Qîranî**

&

Heyder Al Yûsivanî

2025